Dîsan Arîstoteles di karên xwe yê felsefî de hizr û boçûnên xwe derbarê rengan de diyar kirine, ka reng çî ne û çawa dirust bûne. Navên hindek dar û bar û giyaneweran û ew tiştên di hebûnê de, çawaniya dîtina wan tiştan diyar kiriye. Ew, amaje bi wê yekê dike reng ji wan rûdanan dirûst dibin ku di atmosferan de rû didin. (Narmîn, 2006:11). Wate Arîstoteles dirustbûna rengan tîkedarî wan diyardeyan dike ku li gerdûnê rû didin; mîna rojhelatbûnê û rojavabûnê, roj û şevê, baran û befrbarînê, werzên salê û hww. Bandorên van diyardeyan a li ser erdê, dibin egera wê yekê ku reng li ser erdê peyda bibin. Li gor boçûna wî, hindek reng hene ku xwe bi xwe dikevin xwezayê bi rêya destwerdana tîrêjên rojê yê ku alîkar in ku rengê sor dirust pêk bê.

Ebû Yusif Yeçûb bin Eshaq el-Kindî dibêje: Ronahiyê roleke mezin heye di dîtina me ya tiştan de ku di tariyê de her tişt reş e û ne diyar e, ronahî alaveke sereke ya dîtîne ye, ji ber ku reng di hundirê xwe da çawaniyeke hestî ne ji bo dîtîne (Ebdilxefûr, 2008: 4). Mebesta wî jê, ew e ku reng çawanî ye û ev çawanî taybet e bi hesta dîtîne ve, peywendîya wê hiç bi hestên

dîtir ve nîn e mîna hestên bihîstinê û tamkirinê. Lewra bi tenê bi alîkariya hesta dîtînê, em rengan dibînin û jêk cuda dikin.

Dîsan em dişên bi hindêk şeweyên di rengan pênasê bikin: Reng yek ji wan hêmayên bêdeng in, di hundirê xwe de xwedî gelek raman, delalet û sembol in. Ji ber ku di rengan de tiştekî girîngtir diyar dibe, ew jî ramanên berze û neaşkera ne, ev ramanên berze yên rengan bi delaletan tîn dîtîn. Çimkî reng di pêkhatinê xwe de du cihan bi xwe ve digirin, ku peywendiyê amadebûnê çêdikin, digel vê berzebûnê û neamadebûnê diyar dikin (Nihêlî, 2005: 15).

Her wisa zana û pisporên xwezayê peyva “reng”, wekî diyardeyê fizîkî li qelemê didin. Piraniya hunermendên şewekariyê û kesên dîtir ku di vê meydanê de kar dikin mîna karkerên çapxaneyan, peyva “reng” di wateya madeyên boyaxê de, wek “pigments” bi nav dikin ku di berhemên rengan de bi kar tînin (El-Sefar, 2010: 64). Bi wateyê dî, çî ji aliyê berhemdariya madî ya boyaxê reng ve, çî jî ji aliyê tîrojên rojên yên rengîn ve, reng ew bandora fîzyolojî ye ku taybetmend e bi endamên laşê berhemdar ve li ser torên çavan. (Elî, 2001: 7)

Şewekarê kurd Fehmî Balayî jî derbarê reng de wiha dibêje: Reng tiştê herî balkêş e di xwezayê de ku beşdariyê di afirandina ciwanîyê de dike. Reng, yek ji beşên rêxistina hesta mirovan, bi taybetî jî ya hesta dîtina mirov a dîtînê ye. Diyardeya reng li gorî dirêjahiya pêlên ronahiyê di laş de bi alîkariya torên çavan, lêdanên xwe vediguhezîne mêtî û delalet û nîşanan. Diyardeya van rengan jî girêdayî rewşa av, hewa û ronahiya li ser wê madeyê ye (Balayî, 2008: 11-12).

Bi dîtina me, reng nûnertiya wêneyê derve yê şeweyî dike ku vê yekê cihekî taybet girtiye di hunerê de. Lewma bandoreke wî ya mezin heye li ser hest û derûniya mirovan, ku hindêk hestên nû jê peyda dibin wek xweşî, dilfirehî, diltengî û nerehetiyê. Ji ber wan delalet û ramanên wan, rengên li ber çavên me dikevin bo nimûne rengê sor, derbirîna dudiliyê dike; yan şîn ramana dilovaniyê û xerîbbûnê ye; zer jî digel karvedanê û xweşiyê tê behskirin; reş delalet e ji bo gelek tiştan mîna neman û nexweşî, bêbextiyê; rengê spî jî hêvî, aşitî û paqijiyê derdibire.

1. Têgeha Reng ji Layê Edebî, Psîkolojî, Ol û Çanda Gelan ve

Biwarê edebiyatê girîngiyê zor daye ser rengan, bi taybetî jî lewnê helbestê. Ji ber ku helbest huner e wekî gelek hunerên dî, lewra di vehandina helbestan de her afirînerekî/ê alavek heye yan çend alav. Alavên helbestvanan jî peyv in ku bi rêya peyvan dikarin wêneyekî ciwan ê hunerê derbibirin. Cudahiya vî wêneyî li ser asta şarezayî, şewaz, paşxaneya rewşenbîrî, şiyânê edebî û zimanî yên helbestvanan dimîne, da ku pê bikaribin wêneyê herî baş biafirînin ku dê pirî derbirînê û raman bin (El-Mitîrî, 2014: 1). Peywendiya di navbera helbestê û reng de peywendiyê bihêz e ku reng bi şeweyekî diyar û ronî di nav helbestên gelek helbestvanan de reng vedaye. Reng zor tîkelî cîhana wan a taybet a bi xeyal û fantazî bûye. Ji ber hindê jî ji bo afirandina wêneyekî helbestê yê ciwan, bi taybetî helbestvanên kurd gelek çarçûnên birîyê ser rengan ji bo derbirînê felsefî, ramiyî, rewşenbîrî, civakî, derûnî, evînî, estetîkî û ew bi kar anîne.

Gava em ji çarçoveya psîkolojîk ve berê xwe bidin rengan, dê bê dîtîna ku têgeha reng ji layê psîkolojiyê ve boçûnên cuda li xwe girtine û wan bandorên xwe yêna cuda li ser derûniya mirovan kiriye. Di serdemên nû û hevçerx de jî diyar e ku rengan bandoreke mezin heye li ser şaneyên hestiyariyê yêna mirovan, ji ber ku her reng xudan pêleke ronahiyê ya taybet in ji layê dirêjî û kurtiya pêlê ve. Lewra her pêleke cuda ji pêleke dî ya ronahiyê bandoreke cuda heye li ser pergala hestiyarî û derûniyê û ev bandor erênî û nerênî ne (Ubeiyd, 2013: 10). Ji ber hindê jî lêkolînên psîkolojiyê diyar dikin ku reng ne bi tinê hindêk pêl û lerizînên ronahiyê ne; lê ew xwedan bandorên bihêz in ku digihên kûrtirîn xela derûniya mirovan. Ji wan bandoran ên erênî, dibin egera bêhnfirehiyê, viyan, gîrnîjînê û hestên xweş li ba mirovan peyda dikin. Hindêk jî wan jî nerênî ne û dibin egera peydabûna hestên nexweş li ba mirovan.

Bi boçûna me, hebandin û hezkirina rengêkî ji yekê dîtîna cuda û rêjeyî ye li gorî kesan. Ev yek jî guhêrbar e li gorî hestên hundirê kesan. Bo nimûne, dibe ku rengê kesk li ba kesekî/ê rengêkî xweşkiyê be, lê belê li ba kesekî/e dî nehête hezkirin, yan bandoreke erênî yan jî nerênî hebe li ser derûniya wî/ê kesî/ê (El-Zewahîre, 2008: 15).

Her wisa, eger gava em ji riwangeha olî ve li rengan binêrin, dê bê dîtîna ku olan peywendiyêke cuda û taybet bi rengan re heye, rengan di nav hemû tekst û rê û resm û baweriyên de reng vedaye. Her olê li dûv bawerî û taybetmendiyên xwe girîngî daye rengan û her baweriyê cuda ji baweriyên dî çend raman û delalet dane rengan, ew wekî sembola amajê bi kar anîne ji bo derbirînê xwe yêna olî yêna curbecur. Wekî di ola îslamê de rengan rengvedaneke mezin hebûye ji ber ku gelek caran navên rengan di Qur'ana pîroz de derbas bûye. Ji ber hindê jî girîngiyêke mezin pê daye; bo nimûne rengê spî yazdeh caran di Qur'ana pîroz de derbas dibe. Rengê spî di îslamê de delalet e ji bo paqîjîyê, zelalî û karên baş (El-Dorî, 2002: 59). Her wisa di olên wekî êzdiyatî û zerdeştîyê jî de jî reng rengvedana xwe hebûye û her reng jî çend delalet û felsefeyan pêk hatiye.

Her wiha ji layê civak û çanda gelan ve, di navbera mirov û rengan de peywendiyêke bihêz heye. Her mirov li dûv wê jîngeha ku tê de dijî, çî qenc yan xirab bo her rengî, navek daniye da ku her yek ji yêna dî bê cudakirin û bo navên her rengî delalet û ramanên cuda danîne. Bi giştî hindêk pênase ji bo rengan û wateya rengan hatine kirin, ji binyata kultura cîwarên mirovan hatine wergirtin ku her reng bûye xudan raman û delaletêke cuda û taybet. Bo nimûne rengê reş rengê xemgîniyê ye (Hemdan: 2008, 39).

Bi dîtîna me, bi borîna demê û pêşketina rewşenbîrî û jiyânê, rengan gelek bêje, raman û delaletên cuda wergirtine di hemû biwarên jiyânê de. Wate her reng xwedî raman, felsefe, delaletên xwe yêna cur bi cur e, ev yek jî rêjeyî ye û ne cihgir in, lewra ne karekî asan e ku mirov bikaribe ji bo her rengî raman yan delaletêke dirust û taybet destnîşan bike.

2. Delalet û Ramana Navên Rengan

2.1. Rengê Sor

Rengê sor di pileya yekê de ye. Ev reng, ji xwezayê hatiye wergirtin û yek ji rengên serekî û yêna germ e ji ber ku ji tîrojên rojê hatiye wergirtin. Ji ronahî, agir û germatiyê pêk hatiye û

şiyânên hêz û hestên azirandinê li ba mirovan peyda dike. Ji ber girêdana vî rengî bi rengê xwînê ve, ew gelek caran bûye delalet ji bo şer, hevrikî, şoreş, eşq û gelek tiştên dî (El-Yaqût, 2018: 30). Rengê sor di bawerîya gelek olan de delalet û simbolên nerênî wergirtine, ku vê kiriyê ew bibe delaleta cehenemê ji ber girêdana wî bi rengê agir ve ku rengê agir jî sor e (El - Qeran, 1984: 124-128).

Sor rengê ciwanî, gencatî û geşbîniyê ye, ji ber hindê jî gelek helbestvanan di helbestên xwe de ev reng bi kar anîye. Ji layekê dî ve rengê sor li ba civakên rojavayî delaleta hişyarî, hêz, metirsî, hêrs û evîniyê ye. Di civakên rojhelatî de delaleta şensê baş, keyfxweşiyê ye û taybet e dema digel rengê spî têkel dibe. Sererayî wateyên erênî, lê gelek caran jî rengê sor wateyên negatîv li xwe girtine (Fethî, 2022). Em dikarin bêjin: Bi dirêjahiya jiyane rengê sor delalet û ramanên xwe yê taybet hebûne, ev yek jî ji kesekî/ê bo kesekî/e dî, ji civakekekê bo civakeke dîtir cuda ye û ev delalet û raman ne sabît in.

2.2. *Rengê Reş*

Rengê reş hemû ronahiyê dimêje, lewra rengê hêzê û berzebûna ronahiyê ye. Rengê reş, delalet e ji bo xem, bêhêviyê û nemanê, rengê desthelatê û nihênî, şer û xezebê ye. Di civakên rojavayî de nîşana tirs, yaxîbûn, seks, berelayiyê ye (Telal, 2022). Rengê reş gelek girêdayî karên nepenî û hizrên hêzê ye û delaleta derûneke bihêz, kontrolkirin, rêkxistina derûniyê ye. Rengê hêz û desthelatê ye lewma pitirîya bazirgan, kesên siyasî û mafya vî rengî di cilên xwe de bi kar tînin ji ber ku cîhana van kesan taybet û nepenî ye. (Me'abîre, 2022). Kesên hez ji vî rengî dikin, nakevin xeletiyên viyanê çimkî sînoran di navbera xwe û kesên derdora xwe de datînin ji ber hindî jî hez dikin ku jiyaneke taybet a wan bi xwe hebe. Dîsan dibe ku ev rengê bêhnfirehiyê be li ba wan kesan ku xalên wan ên lawaziyê hene ku dixwazin bi rengê reş bîn veşartin. Gelek caran dibêjin rengê reş wek fêlekê tê bikaranîn di cil û bergan de ji bo ciwankirina bejn û bala mirovan, bi taybetî jî li ba jinan (Telal, 2022).

Dibe ku li ba gelek kesan rengê reş, rengê li dijî ciwanîyê be û rengê xemgînî û reşbîniyê be. Lê gelek caran jî delaleta ciwanîyê ye. Rengê reş li dûv dem û deveran wateya wî dikare biguhere.

2.3. *Rengê Spî*

Rengê spî ji rengên sar e, lewra hestê aramiyê li ba mirov peyda dike. Rengê spî hemû rengan kom dike, mirov dikare vê rastiyê di bazneya rengan de bibîne ku bi lez hêza ronahiyê zêde dibe (Şukrî, 1985: 85). Rengê spî tê hejmartin ji rengên aram û her wisa hesta tenahiyê li ba mirovan peyda dike. Ji ber hindê jî gelek caran mirov malên xwe bi rengê spî boyax dikin da ku hest bi aramî û bêhnfirehiyê bikin. Ji ber hindê rengê spî digel rengên cuda têkel dikin ji bo guncandin û kêmkirina hêz û pîleya wî (Tesnîm, 2021).

Bi dîtina me, delalet û ramanên rengan li gor dem û cihan guhêrbar in, ramanên erênî û nerênî li xwe digirin. Lê di pitirîya kevneşopîyan de rengê spî nasyar e wekî rengê ciwanî û berdewambûna jiyane. Bi boçûna me, rengê spî rengê bêgunehî, paqijî û tendirustiyê ye, dibe ku ji ber hindê be jî rengê spî li nexweşxaneyan û cihên tendirustiyê tê bikaranîn.

2.4. *Rengê Zer*

Yek ji rengên germ e ku hestên germahiyê li ba mirovan peyda dike, nûnertiya ronahî û çirûsînê dike. Çimkî rengê rojê ye û çavkaniya ronahiyê ye û girîngiya xwe heye ji layê germî û ronahiyê ve. Her wisa rengê zer gelek delalet hene; mîna xweşiya jiyane, aktîfbûn û azirandina hestan, pitirîya caran ev reng dibe egera peydabûna xweşi û dilfirehiyê (Şukrî, 1985: 6). Dîsan ji layê gelek olan ve girîngî û pîroziya xwe heye. Bo nimûne li ba misriyên kevin delaleta xwedawend “Re” ye, ku ew xwedawendê rojê bû. Ji bilî misriyên kevin, li ba îslamê jî pîroz e, ji ber ku di Qur’ana pîroz de di sûretê “Beqere: 69”ê de derbas dibe (Muxtar, 1982: 163).

Her wisa rengê zer, gelek caran raman û delaletên negatîv jî hene wek delaleta mirin û ew wekî nîşanên nexweşiyên bûye. Ev delalet û wate jî ji xwezayê, ji zerê payîzê hatiye wergirtin. Çimkî dumahîka zerbûn û weşîna belgan e, rengê keskê dar û beran di werza payîzê de rengê zer digire ku xweza wek rengê beyabanê zer dibe (El-Yaqût, 2018: 29). Bi boçûna me dibe ku ji ber wê yekê be rengê zer delaleta nexweşî û mirinê û nêzîkbûna ji ecel li xwe girtibe, ji ber ku gelek caran ev reng bûye cihê dilgiraniyê ji layê derûniyê ve.

2.5. *Rengê Şîn*

Rengê şîn gelek wate û delaletan li xwe digire, ev yek jî li gorî tarîti û vekirbûna pîleya vî rengî ye. Ji ber ku şîne tarî nêzîkî rengê reş e ku bandora xwe heye li rengê ku nêzî wî ne, delaleta nexweşî û mirinê ye. Lê rengê şîne vekirî taybetmendî û girîngiya xwe hebûye di kevneşopan de û heta serdema nû jî girîngiya wî maye. Ji ber ku rengê derya û esman e ku bandoreke rasterast li derûniya mirovan dike, hestên xweş û hêviyan bi mirovan re peyda dike (Abad, Belawî, 2012: 28).

Wate rengê şîn ji layê derûniyê ve jî dibe sebaba bêhnfirehî û arambûnê. Her wisa mimkun e ku cîhaneke hestan a xeyalî li ba mirovan peyda bike ku mirov tê de hest bi hênikahiya xweşbûna keş û hewayeke hênik bike.

Gelek caran li ba gelên cuda, delalet û ramanên cuda li ser wî hebûne, çawan ku li cem çîniyan delaleta mirinê ye û li ba ibriyan jî rengê Xweda ye, lewra ye ku cihû vî rengî pîroz dibînin (Muxtar, 1982: 164-166). Her wisa li ba ereban jî rengê şîn regekî nexweş e û nayê hezkirin, heta vê serdemê jî ji vî rengî hez nakin nexasim jî di rengê çavan de. Çimkî rengê çavên dijminên wan ên romanî şîn bû (El-Yaqût, 2018: 29).

2.6. *Rengê Kesk*

Rengê kesk ji hemû rengan berbelavtir e, çimkî piraniya xwezaya derdora me rengê wê kesk e. Keskatiya xwezayê dibe cihê arambûna derûniyê û hiş. Gelek caran jî rengê keskê vekirî bêhtir tê qebûlîkirin ji rengê keskê tarî. Çimkî rengê keskê vekirî bêhtir bêhnfirehiyê li ba mirovan peyda dike (El-Yaqût, 2018: 66). Ji ber ku rengê kesk rengê arambûna derûniyê ye, bo çavan xweş e û ji layê çavan ve tê hezkirin û hiş mirov pê aram dibe. Lewra mimkun e ku gelek caran di dema bêhtengî û hêrsê de girîng e ku mirov biçe li nav dar û bar an baxçeyekî

li kûr binêre da ku derûniya mirov aram bibe. Ji ber vê yekê ye ku cil û bergên nojdarên kesek in ji bo nexweş ji layê derûniyê ve hest bi hêminî û arambûnê bikin.

Dîsan rengê kesek ji aliyê olan ve jî girîngî û pîroziya xwe heye, ol gelek caran di rê û resmên xwe yên olî de vî rengî bi kar tînin. Ji ber ku delaleta tobekirin û nêzikbûna berev Xwedê ye û rihetiya derûniya mirovên îmandar e. Her wiha di ola îslamê de rengkirina mizgeftan bi rengê kesek ji ber wê yekê ye ku rengê bihuştê û dar û berên firdewsê ye. Digel vê, di Qur'ana pîroz de derbas dibe ku rengê cilên buhiştîyan kesek e. Ev yek jî bûye cihê taybetîbûn û girîngiya rengê kesek di ola îslamê de (El-Yaqût, 2018: 26-27).

Bi şêweyekê giştî em dikarin bêjin: Rengê kesek delalet e ji bo jiyan, geşbînî, hêvî, ciwanî û merdatiyê, û nûkirina ruh simbolîze dike. Rengê bihar û gencatiyê ye, tenahî û pêşdaçûnê, aşîti û aramiya derûniyê ye, rengê hemû tiştên zindî ye.

3. Delalet û Ramanên Rengan li ba Kurdan

Her wekî me diyar kiribû, delalet û ramanên rengan li gor cih, jîngeh, bawerî û xwezaya deveran e. Bo nimûne delaletên rengan li ba civakan cuda ye, li deverên xwezaya wan jêk cuda ne yek e. Li ser meseleyê, raman û delaleta rengan li ba kurd û ereban ne wek hev e. Çimkî ji layê xweza û jîngehê ve cudahiyeke mezin di navbera wan de heye. Xwezaya Kurdistanê bi rengên cur bi cur xemilandiye, ji ber ku devera Kurdistanê tîjî ye ji zozan, rûbar, çiya û dar û beran. Ji ber vê egerê ye ku reng tev li hemû jiyana wan bûye. Têkelî nava ziman, huner, edeb, nexş û nîgarî, civak û nêrîtên wan bûye. Reng rengvedana xwe hebûye di jiyana rojane ya kurdan de.

Bi wateyêke dî rengan di nav dil û derûniya mirovên kurd de cihê xwe girtiye, rengên xwezaya wan bûye egera vê çendê ku bandora xwe li ser takên kurd hebe. Di hişmendiya wan de çespaye û bandora xwe li hizr, bîr û baweriyên wan kiriye. Ev yek bûye sedem ku curbecuriya reng û bikaranîna gelek ji layê civakî, rewşenbîrî û hizr û bîrên olî ve di jiyana kurdan de hebe (Rondik, 2017: 4). Her wisa di edebiyata kurdî de bi taybetî jî di lewnê helbestê de, rengan bi şêweyekî diyar û aşkera di nava helbestên gelek helbestvanan da reng vedaye. Çimkî jiyan û jîngehên wan bi şêweyekî rasterast û nerasterast bandorê dike li ser bikaranîna rengan di helbestên wan de. Çimkî xwezaya Kurdistanê bi rengan tije ye.

Weke ya gelên dî, di çanda kurdan de jî her rengî girîngî, delalet û ramana xwe heye. Bo nimûne; rengê sor li ba kurdan ji layekî ve delaleta xweşî û şadiyê ye, ramana hest û viyanê ye. Lewma jinên kurdan wî gelekî di cilên xwe yê govendan de bi kar tînin. Ji aliyekî dî ve sor, nîşaneyê qurbanîdanê ye, di serdemên jiyana kevin de li Kurdistanê nexasim jî li gundan, di helkeftên pîroz de hêk ji bo zarokan sor dikirin ji madeyêke sor a ji rehên giyayê "beqemî" amade dikirin (Balayî, 2008: 12). Dîsan rengê kesek li ba kurdan renekî girîng û pîroz e ji layê kurdên misilman ve, rengê kesek delalet e ji bo aramî û razemendiyê, çimkî rengê kesek ji layê derûnî ve jî bêhnfirehiyekê dide mirov, lewra ji layê bawerîya olî ve kurdên misilman pîrozî daye vî rengî. Dîsan, lewra ye ku gelek cihên olî bi rengê kesek hatine rengkirin, di perestgeh û cil û bergên olî de rengê kesek bi kar anîne. Her wisa kurdên êzidî jî girîngî daye vî rengî ku rengê vejîna jiyanê û geşbûnê ye û di gelek tekstên wan ên pîroz de rengê kesek derbas dibe, wan ew wek delalet ji bo gelek tiştan bi kar anîye. Her wiha rengê spî li ba kurdan delalet e ji

bo aştî, ciwanî û paqijiyê lewra ye ku cilên bûkan bi rengê spî xemilandî ye ku ev raman û delaleta paqijî, şeref û bêgunehiya bûkê ye. Her wisa di hindek nerîtên civakî de dema kesek rengê spî dikeve pora wî/ê ku delaleta mezinahiya jiyê wî ye dibe cihê bawerîpêkirin û rêzgirtina kesên derdorê ya ji bo wî/ê. Rengê reş jî delaleta xemgînî û bextreşiyê ye li ba kurdan ji bo taziyyên xwe rengê reş bi kar tînin wek derbirîna xema xwe. Her wisa hez ji “pisika reş” nakin ku delaleta bextreşiyê ye li ba kurdan. Lê cuda ji van nerînan, hindek caran jî wekî delaleta ciwaniyê jî rengê reş bi kar anîne wekî por reş, birî û çavên reş û hww. Dîsan rengê zer nerînen cuda bi xwe ve girtine ji ber ku renekî vekirî û zîq e, genc wî di cilên xwe de bi kar tînin bi taybetî jî jin. Lê hindek nexweşî jî ji rengê zer bi nav kirine; mîna nexweşiya zerikê. Rengê şîn li ba civaka kurd wek delaleta parastinê ye ji çavên bexîlan, ev reng bi taybetî ji bo zarokan hatiye bikaranîn, morîkeke ji rengê şîn bi cilên wan ve dikin da ku bînan parastin ji her tiştên xirab û çavên pîs. (Rondik, 2017: 50-51-52). Gelek caran hindek kurd navên xerîb û cuda ji bo rengan bi kar tînin, mîna; kej, boz, xemrî, esmer, sîs û hww.

4. Reng û Helbest

Reng yek ji alava girîng a afirandina teksteke edebî ye, bi taybetî jî ya afirandina helbestê. Çimkî bihayekî estetîk û hunerî yê bilind dide tekstê. Gelek ji wan rengan dibin simbolên xwedan delalet û ramanên curbecur ku ev yek dibe egera çêjwergirtineke cuda di xwendina wan tekstan de.

Reng û edebiyatê peywendiyêke mukim û bihêz bi hev re heye. Çimkî edebiyat li ser binyata ziman û wêneyan tê afirandin ji ber ku di nava ziman û wêneyê de reng hene. Ev yek jî têkildarî bi şêwazê nivîser û paşxaneyê wî/ê ya rewşenbîrî û edebî ve heye ka çawa serederiyê digel rengan dike li gorî cure û teksta edebî ya ku tê nivîsandin. Reng, bi roleke mezin radibe di rîtm muzîk û şêwaza hunerî û zanista delaletê de, ew jî ji ber wan simbol, wate û felsefeyan e ku li pişt her rengî heye. Ev yek jî li gorî cureya dahênana afirîneriyê diguhere (Xanikî, 2011: 19).

Her wisa taybetmendiya hindek rengan amajeyî û yan hinekan jî simbolî ye, lewma bikaranîna wan a di helbestê de ne belasebeb e, jê wêdetir kiryareke hişyarane ye û ev kiryar dike ku helbest berev rîtm û harmoniyekê biçin. Helbestvan reftarê digel rengan dikin weku diyardeyek ji diyardeyên zimanê helbestê, girîngiya vê diyardeyê di wê çendê de ye ku reng parçeyek ji ferhenga helbestvanan tene dîtin, ew ferhenga helbestvan ji bo avakirina helbestan û ji bo berhemanîna delaletên taybet ên di helbestê de tene bikaranîn (Nihêlî, 2005: 160). Wate, edebiyat bi hemû cureyên xwe ve ji delalet, raman û felsefe û rîtm estetîka rengan ne bêpar e û di teksta edebî de reng roleke girîng dibînin, bi du şêweyan -rasterast an nerasterast- tene bikaranîn.

Bi boçûna me, nivîskar ji bo teksteke estetîk û tijî simbol, penayê dibin ser rengan ji rengan û her reng ji bo hindek merem û derbirîn, simbol û delaletan tene bikaranîn. Ew tekstên ku reng tê de hene, pirtir nêzikî xwendevan dibin. Çimkî reng derbirîne ji serboriyên mirovayetiyê dike û bi awayekî bandora xwe li ser hestên xwendevan dike, ji bo peydakirina hestên xweş an nexweş. Ji ber ku dibe ku reng gelek wateyan bide li gorî şêwaza derbirîna nivîskaran û her xwîner li gorî bandora wî rengê destnîşankirî bandorê werdigire.

Bo nimûne, dema hebûna rengê sor di nava tekstê de hebe, dibe ku ew reng li ba xwendevanekî/ê ramana xweşî û evîniyê bide û hestên wî/ê yên romantîk biazirîne û bandoreke baş bike li ser; lê belê dibe ku li ba yeka/î dî ramana nexweşî û qurbanîdanê bide û derûniya wî têk bibe. Wate her kes li gor serborî û têgehiştina xwe ji wate û delaleta wî rengî têdigihêje.

5. Delaletên Rengan di Helbestên Mueyed Teyib de

Helbestvan Mueyed Teyib yek ji helbestvanên bi nav û deng ê kurd e ku di vehandina helbestê de hêza xwe ya erênî ji rengan wergirtiye. Di piraniya helbestên xwe de behsa rengan kiriye. Em dişên ku bibêjin helbestên wî bi rengan hatine tamdan. Wî, reng kirine havêna berhemanîna wêneyên curbicur. Lewra jî di dema xwendina helbestên Mueyed Teyib de em hest pê dikin ku aşnayî nîgarkêşekî bilîmet dibin. Di piraniya wan helbestan da reng berceste bûne. Lê me bi tenê hindê helbestên wî hîlbijartine ku gelek kod û delaletên rengan di nava wan de hatine bikaranîn.

Em dê di vê pişkê de ji riwangeha delaletên rengan li ser helbestên Mueyed Teyib praktîze bikin. Ji dîwanên helbestvan çend helbestên nimûneyî bineqînin û mijarên teorîk ên rengan di wan helbestan de analîz bikin. Di vê pişkê de me ji dîwanên wî çend helbest hîlbijartin ku ji nav hemû helbestên wî herî zêde ev bi temaya rengan derdikevin pêş. Bi vê şêwazê armanca vekolînê bi taybetî di vê pişkê de dê bê bidestxistin. Ev helbest li jêrê hatine destnîşankirin.

5.1. Helbesta “Şîn”

Di vehandina vê helbestê de helbestvan hez kiriye ku bi şêweyekî ciwan û xemleke rengîn derbirîna ji xeyala xwe bike. Lewra ji hindê parçeyên wêneyan, wêneyekî helbestê yê giştî dirust dike, ku hêviya helbestvan ew bûye bi ku bi afirandina hindê hestên nazik peyvên balkêş mebesta xwe bigihîne cih, da ku mebesta wî bo xwendevanan ron û aşkera bibe

Hin caran dîmenên xwezayê di hebûna hestên helbestvan de dibin dîmenekî ciwan û çarçoveya armanca ku ew li hêviya wê ye, em wan di hestên xwe yên veşartî de dibînin. Lewma di ferhenga peyvên de wêneyên rengîn jî têne dîtîn. Ew wêneyan mîna tabloyeke hunerî pêşkêşî xwendevanan dike.

Di vê helbestê de helbestvan xwestiye jiyanê nû yan jî rewşeke nû dirust bike, li gorî ew xeyala ku di serê wî de heye; ji dêvla rengê xirab yekî baştir. Helbestvan rengê şîn bi kar anîye xuya ye ku rengê şînê vekirî delalet e ji bo tenahî, hêvî û paşeroja geş. Çimkî di vê helbestê de helbestvan behs ji pileya rengê şînê vekirî dike, dema dibêje; “Sê şîn kubar in: Esman û derya û çavên te” ji ber ku rengê deryayê hemû gavan bi rengê şînê vekirî ve tê têkildarkirin. Dîsan helbestvan çav, esman û derya bi rengê şîn salox daye ku çavên şîn delaleta ciwanî û hêviyê ne, rengê şînê esmanî û deryayê me dibe cîhana paqijî û zelaliyê.

Sê şîn kubar in:

Esman û

Derya û

Çavên te.

Esman min dikete:

Balindeyekî spî.

Derya:

Pêleka sor.

Çavên te helbesteka şîn.

Şîn

Wek dilê te

Wek tatoya wê belatînka

Dadaye ser milê te (Teyib, 2021: 73-74)

Bandora rengê şîn li ser derûniya helbestvan diyar û zîq e, lewra helbestvan rengê şîn kiriye keresteya helbesta xwe. Çimkî ew şîn kubariya esmanî ye û wî dike balindeyekî spî, û hêza bilindfirînê pê re peyda dike da ku bikaribe bi azadane bijî û li bilindtirîn xalê bifire. Balinde bi xwe yek ji wan bûneweran e ku delaleta hêzê û azadiyê ye çimkî balinde; azad difirin, azad dijîn, azad dimirin. Lewra helbestvan balinde bi kar aniye wek ramana azadiyê. Dîsan di dirêjîya vê helbestê de helbestvan behs ji pêleke sor dike, helbet rengê sor delaletên baş û xirab di hundirê xwe de hildigire. Dema helbestvan dibêje “Pêleka sor”, ku pêlên deryayê ji rengê şîn guherîne berev rengê sor, her dema rengê sor tê bikaranîn, yekser mirov bîr li xwîn, şer, kuştin û qurbanîdayîne dike. Çimkî rengê sor renekî bihêz e di kiryarên xwe de.

Bikaranîna rengê sor di vê helbestê de delaleta nakokiya derûniya wî ye da ku bişê piçekî derbirînê ji xemgîniya xwe bike. Lewma wî hêviyên xemgîn ji jêdera sereke ya xeyal û hest û hizrên xwendevan dûr birine, wî neviyaye her tiştî wek ku heye nîşanî me bide, em ber bi hizirkirinê ve birine da ku em têbigihên ku ew tiştên nepen jî amaje bi têgihîştina jiyane dikin.

Reng di wêneyê helbesta Mueyd Teyib de derbirîn e ji derûniya wî û wek pireyekê ne bo derbirîna wî ya hundirîn. Helbestvan şarezayê derbirîna rengan e, lewma bi hesteke hunerî û helbestî reng bi kar anîne. Dîsan dubarebûna peyvên a di vê helbestê de ji ber ku bi şarezayî û di xizmeta ciwaniya helbestê de hatine bikaranîn, mirov hest bi nexweşî yan kêmasiya vê dubarebûnê nake. Ji egera vê dubarebûnê rîtim û ciwanî di cihê xwe de hatiye bikaranîn. Lewma di navbera dubarebûn û wêneyan de reng xwe dibînin, ji bo ku berev rewşeke nû ve bibe wek rizgariyekê ye ji rewşekê bo yeka dî.

5.2. *Helbesta “Gerdena te aza”*

Hoo ey... Ewa

Ji çavên te yên kesk

Werzeka buharê barî û

Salekê

Berif...

Ji bo wan şevên kesk û sor

Mala te ava...

Ji bo şevên spî jî

Gerdena te aza... (Teyib, 2012: 127-128).

Li vê derê helbestvan pesna evîndara xwe bi derbirîneke dî kiriye, reng e ev derbirînên helbestvanî bi kar anîne di vê helbestê de ji perçeyên wan nîgaran bin ku ji serboriya eşqê mane, lewra rengên “kesk û sor” tê de derbas dibin ku keskatiya çavên wê delaleta jiyana û ciwaniyê ne. Digel hindê jî ew ciwaniya çavên yara wî heta maweyeke dirêj û heta radeyeke mezin ew eşandiye. Dîsan bikaranîna rengê sor, ku sor gelek raman û delaletên ciyawaz li xwe girtine, ev yek jî ji kesekî/ê bo kesekî/e dîtir cuda û rêjeyî ye û dibe ku rengê sor bandorên baş û xirab hebin li ser kesan. Rengê sor rengê hestên bihêz e ku ew hest girêdayî eşqê û azirandina derûnî ne. Rengek e ku hestên germ û bihêz li ba mirov peyda dike, çimkî rengê sor bandoreke bihêz dike li ser pergala hestyariya mirovan. Lewra helbestvan sor bi kar aniye, çimkî rengê sor girêdayî dilsozî û evîniyê ye “şevên kesk û sor” şevên evînî, romantîk û seksê sembolîze dikin. Xuya ye delalet û sembol di vê helbestê de rûyekî geş in û helbestvan ew kirine binyat ku helbesta xwe jê vehûne.

Dîsan helbestvan di helbesta xwe de peyva “şev” bi kar aniye. Her wekî diyar e şevê bandora xwe li helbestvan kiriye. Ew şevên ku bûne havêna xeyalên helbestên gelek helbestvanan û bêdengiya jiyanê efsaneyî û romantîk. Şevê peywendiyêke mukim digel hest û azmûna helbestvan ya derûnî heye. Dîsan bikaranîna rengê spî dema ku dibêje “şevên spî jî gerdena te aza”, merema wî ji şevên spî, ew şevên zivistanê yên sar û dirêj in, ew şevên spî delaleta hindê ne ku bitenê maye û wan bandorên nerênî li ser derûniya helbestvan kiriye, xuya ye ji vê beyta helbestê ku helbestvan di barûdoxeke derûnî ya nexweş re derbaz bûye ku xemgînî lê zal bûye. Lê di ser hindê re ji bo wê viyana mezin a di dilê wî de yên beramberî yara xwe, her cara bitenê maye û ji destê tenêbûna xwe êşiyaye, lê digel vê yekê jî gerdena wê aza dike.

5.3. *Helbesta “Qîflî”l-teftûş: Raweste bo kuştinê*

Nîvroyeka tîrmehê bû

Roj agir bû

Bihost, bihost rê dax kiribû

Ew rêka reş

Fena lêmiştî burkana

Rûybarekê dozexê bû

Rêjgeha wî...

Dilê gola zêrê reş û

Xebata sor û xewnêt kesk (Teyib, 2014: 125-126).

Di vê helbestê de bûyer trajedî ye, lewma helbestvanî pena biriye ser rengê reş. Ev jî girêdayî rûdanê ye û rengvedana derûnî, civakî û kevneşopiya ku helbestvan tê de dijî jê diyar e. Peyvên vê helbestê hatine xemilandin bi rengê reş, wate helbestvan kariye wan wêneyên ku di nava vê helbestê de hene bi reşatî derbibire. Dîsan helbestvan behsa “rêka reş” dike ku bi rengê reş wêne kiriye û têkeliyek di nava rengê reş û dîmen de ava kiriye û destpêka helbesta xwe bi rengê reş salox daye. Lewra, bikarîna rengê reş ji bo derbirîna wan nexweşî û wê derdeseriya kurdan e ku ji destê rejîma zordar a Be'sa Îraqê ve hatiye kirin, ku hemû rê digirtin ji bo nehêlana miletê kurd. Lewra ye ku wî ev helbesta xwe bi rengê reş xemilandiye û kiriye delalet ji bo mirin û nexweşiyê.

Di vê helbestê de helbestvan gelek remz, sembol û delalet bi kar anîne. Ji wan jî dema behsa “gola zêrê reş û xebata sor û xewnên kesk” dike, “xebatekê” jî lê zêde dike ku saloxa vê xebatê bi rengê sor û xewn jî bi rengê kesk daye. Di delaletên kevneşopa civakî de rengê sor pitirya caran, delalet e ji bo xwîn û qurbanîdayînê û kesk jî rengê başî û jiyanê ye. Wate behsa wan qurbanan dike ku di rêya berxwedanê de hatine dayîn, da ku rojekê miletê kurd bikaribe wekî her neteweyên li ser rûyê erdê bi tenahî û xweşî bijî.

Her du bira peya bûn û

Kekê mezin... tu were pêş!

Şitlekê spîndara çiya

Hejde buhara kesk krî

Dêmekê nazik û spî

Tavê birî (Teyib, 2014: 129-130).

Bikarîna daraza “Hejde buhara kesk krî” delaleta gencatiya temenê wî kesî dike. Ji ber ku peyva “buhar”ê bi kar aniye ku mebesta wî werza biharê ye ku yek ji wan werzan e, tê zanîn bi ciwaniya xwe û werza vejînê ye, çimkî her tişt tê de xemla xwe dike. Xweza, bi rengê keskekî vekirî balkêş tê xemilandin, gul û giya di vî werzê de şîn dibin, her wiha dema şev û rojê tê de jî dibin bi qasî hev. Rengê keskê biharê kiriye delaleta destpêka jiyanê û bêgunehiya ji hemû tiştan; lewra rengê spî yekser piştî rengê kesk bi kar aniye, dema dibêje:

Di tileke destê wî yê rastê da

Xelekeke zirav, zêrîn

Di dilê wî da

Esmereka şeng û

Baxçekê kesk û

Rêzeka çiyayên befrîn (Teyib, 2014: 131).

Rengê spî piraniya caran dibe delaleta paqijî û aşitiyê. Ji ber hindê helbestvan saloxa dêmê wî bi rengê spî daye, dêmê spî ramana ciwanî û bêgunehiya wî kesî ye. Lewra rengê spî, di piraniya civakan de renekî xoşewîst e li ber dilê her kesî. Lewma helbestvan rengê spî bi kar aniye û her wiha spî ji rengên sar e ku aramî û dilfirehiyê li ba her kesî peyda dike. Dîsan spî wek delaleta ciwaniyê bi kar aniye ku zelalî û ronakî jî taybetmendiye rengê spî ne. Ji ber

vê yekê ye ku wî, rengê spî di vê beytê de kiriye ramana bêgunehî û ciwaniyê. Her wisa helbestvan amaje daye bi rengêkî cuda ji rengên dîtir, ku “esmer” e ev reng û ji têkelkirina rengê reş û spî pêk tê. “Esmerî”, di civaka kurdî de delaleta ciwaniyê ye û nexasim jî jin bi vî rengî ve tèn pesinandin. Ji ber vê kevneşopiya civaka wî bûye ku helbestvan nexwestiye jê dûr bikeve.

Dîsan saloxdana baxçe bi rengê kesk delalet e ji bo destpêkên nû, her wiha delaleta tendrustî, xweza, hêz, aktîfbûn, başî û aşiyê ye. Digel vê, ji bo hezkirinê ye jî, çimkî dilê mirov zû li her tiştên kesk dikele; mîna dar û bar û xwezayê. Dîsan kiriye delaleta mana jiyana nîfşên mirovan e, çimkî di koka xwe de rengê kesk delaleta jiyane ye. Helbestvan temamtiyê bi helbesta xwe dide:

Roj bû sîleka reş û xwe havête

Bextê ewreke reştir

Ax bû burkan û bîvelerz

Dêw û dehba sema li ser kir

Ew xelege zirav-zêrîn

Til lê qed kir

Esmera şeng

Ew bûka hêj nebûye bûk

Hîzara xwe havêt û

Xemla xwe reş kir

Çîmena kesk

Agrî girt (Teyib, 2014: 132-133).

Di vê helbestê de helbestvan bi dilekî melûl û peyvên xemgîn, şiyaye derbirîne ji hestên xwe yê şa'irane bike ku ew hestên heyî ji bo mirovayetiye û bi taybetî ji bo wan takên hanê ne ku ji mafên jiyane bêpar dibin. Her wekî me gotî; bûyer trajedî ye, lewma helbestvan pena biriye ser rengê reş. Reşbînî di helbestên Mueyed Teyib de gelekî zal e, lewma reş kiriye delaleta kabûsan û ehrîmenî û di helbestên wî de jiyane bi mirîne hatiye guhartin. Di navbera realîte û derbirîne de pena biriye ser remz, sembol û delaletên di rangan de. Lewma ye ku helbestvan bi rêka vehandina vê helbestê şiyaye, ew êş û azara ji ber rûdana vê bûyerê nîşanî me û hemû dinyayê bide, helbestvan wiha dirêjahiyê dide vê helbesta xwe:

Di paxila wî da

Nivîştîyeka keska şêxî û

Di berîka çepê da

Çengekê tovîkên gulberojê û

Ya rastê jî deh şekirok

Hindî salên temenê wî

Ne rojekê bi ser çiya keftibû

Ne befra keviya xwaribû (Teyib, 2014: 140-141).

Bikaranîna rengê kesk a di vê beytê de bi şiklê “Nivîştîyeke keska şêxî” ye. Mebesta helbestvan jê ew e ku hê ev kes zarok e û misilman e. Di kevneşopiya civakî û olî de li ba miletên îmandarên misilman, dema zarokên wan ji dayik dibûn û heta digihîştin jiyekî mezin wan “nivîşt” bi wan ve dikirin an jî dikirin paxila wan, da ku ew dûrî nexweşî û belayan bibûna. Rengê kesk ji aliyê olî ve girîngî û pîroziya xwe heye, misilman gelek caran di rê û resmên xwe yê olî de vî rengî bi kar tînin. Ji ber ku delalet e ji bo tobekirin û nêzîkbûna li Xwedê û rihetiya derûniya mirovên îmandar. Di ola îslamê de rengê kesk li wê yekê vedigere ku rengê cilên bihuştîyan e û dar û berên bihuşt û firdewsê ye jî. Vê yekê jî kiriye ku cihê taybetîbûn û girîngiya rengê kesk li ba ola îslamê hebe. Wate, her olekê delalet û felsefeyên xwe yê taybet derheqê her rengî de heye. Di ola îslamê de jî rengê kesk pîroz e û delalet û ramana baş û xêr û bereketê ye. Di hundirê xwe de rengê kesk, gelek delaletan werdigire û renekî xweş û qebûlkirî ye ji layê hemû kes û bawerî û olan ve. Lewra ye ku ev reng di piraniya bawerî û olan de delaleta paqijî, bêgunehiyê ye. Lewma jî helbestvanî pena biriyê ser vî rengî.

Ji ber ku bûyer, qewameke rastî ye bi şeweyekî giştî helbestvanî xwestiye ku bi rêya vê helbestê derbirîna vê karesata cerghejin bike. Bi dilekî melûl vê yekê vedigêre. Ev helbest bi renekî kûr û cuda hatiye nivîsandin, da ku wêneyekî ronî û aşkera berbiçav bike, hawareke mezin bixe guhê hemû dinyayê, ji bo bizanin ka çi tawan û zoriyeke ji vê mezintir tune ye ku li ser mirovan hatiye encamdan.

5.4. *Helbesta “Ne ba min siwar diket... Ne ax min peya diket”*

Ez takebelgê zer û pêti me

Vê payîza dereng

Bi gûlpên vê darê ve mayim

Ne ba

Min siwar diket

Ne ax

Min peya diket (Teyib, 2014: 247).

Di vê helbestê de helbestvan bi awayekî xemgîn û tijî kovan derbirîne ji bextreşîya xwe dike, ku çarenivîsê xwe daye destê qederê û saloxdana derûniya xwe dike. Ew xwe li hemberî qederê bêçare dibîne dema ku dibêje; “Ne ba min siwar diket... Ne ax min peya dike”. Bikaranîna rengê zer di vê helbestê delalet e ji bo nexweşî û lawaziyê. Ev delalet û raman di reseniya xwe de ji xwezayê, zerê payîzê hatiye wergirtin. Çimkî ew dumahîka zerbûn û weşîna belgan e, rengê keskê dar û beran di werza payîzê de rengê zer digire. Dibe ku ji ber wê yekê ev reng bi kar anîbe, ji ber ku di heman demê de payîz delaleta nexweşî û nêzîkbûna ecelê mirinê ye jî. Lewra ye ku gelek caran ev reng bûye cihê dilgiraniyê ji layê derûniyê ve.

Xuya ye dema ku hemû dergeh li mirov têne girtin, hindêk caran mirov neçar dibe ku giliyan bike. Ev cure gilî jî pêleya nearamiya derûniya helbestvan nîşanê me dide bi rêya reng, peyv û wêneyan. Helbestvan dîtîye ku hemû dergeh li ber wî girtî ne, hîç tiştek nîn e ku bikaribe dergehên umîd û hêviyan li bihareke rengîn veke. Lewra ye ku dibêje:

Rojên kurt û tarî

Şevên reş û bêdawî

Wek koremarekî

Di gerdana min aliyayî ne û

Ez mirim bo

Fireke bay û

Çengekê hetavê (Teyib, 2014: 247).

Ji vê beyta helbestê xuya ye ku helbestvan di barûdoxa derûniyeke nexweş re derbas bûye, ku vê yekê jî xemgînî zal kiriye li ser hestên wî. Lewra rengê reş bi kar aniye wekî delaleta xemgîniya xwe û gihîştîye wê radeyê ku ji ber wê xema xwe roj û şevan jêk cuda nake. Her wiha ji ber wê yekê ye xewnekirina bi şev, westîna hizr û hestan, nexweşî û nearamiya wî.

Li dumahiya vê helbestê, helbestvan neçarî hevoka “Ez mirim bo fireke bay û çengekê hetavê” dibe. Ev peyvên ji hevoka dumahiyê ya ku helbestvan di helbestê de derbirîne, wê yekê diselmîne ku yê di rewşeke aloz û dijwar de, belkî bikaribe bi rêya peyvan hindêk ji êş û azarên derûniya xwe ya birîndar reha bibe. Belkî bikaribe ji rewşeke nebaş ku tirs ji nexweşî û mirinê, penayê bibe ser hêviyan û daxwaza jiyan û xweşiyê bike.

5.5. *Helbesta “Fireke bay”*

Helbestvan helbesta “Fireke bay” bi şeweyê zêmarê vehandiye. Helbesta zêmarî di nava kurdan de berbelav e, çimkî neteweyê kurd ji wan neteweyan e ku gelek nexweşî dîtine. Çimkî bi hemû alav û rêkên cuda dijiminan hewla qirkirina neteweyê kurdan kiriye. Lewra helbesta zêmarî bergînda nexweşiyên e, helbestvan bixwaze yan nexwaze dê peyvên xemgîr bi kar bîne. Lewma dema dibêje:

Mir

Kesê fireka avê

Bi devî da nekîr

Kaniyê got:

Destê min geheştinê.

Her du destên min bişkîn.

Rûbarî got:

Li ser rêka min nebû.

Her du rûyên min reş bin.

Baranê got:

Min ne dît.

Kurahî bi her du çavên min da bête xwar.

Axê got:

We fireke bay

Ji çiyayekî befir lê may diviya ne av (Teyib, 2021: 47-48)

Bûyer trajîdî ye, lewma helbestvan peyvên melûl bi kar anîne. Ev jî girêdayî rûdanê ye û rengvedana civaka ku helbestvan tê de dijî jê diyar dibe. Helbestvan xwestiye wê nexweşî û derdeseriya bi serê miletê wî de hatiye, bi rêya helbestê nîşanî me bide, û ew bi wê nearamiyê helbesta xwe vehûnaye.

Bikaranîna rengê reş di vê helbestê de kiriye delaleta bêşensî û şermazariyê ye. Helbestvan ji kevneşopiyên civaka ku tê de dijî pir dûr neketiye û guhartin di rengan de nekiriye dema ku dibêje; “Rubarî got: Li ser rêka min ne bû, her du ruyên min reş bin”. Peyva “rûreş”, li ba kurdan delaleta şermazariyê ye. Helbestvan berev sembola û remzan ve çûye, ew kirine delaleta wî/ê kesê/a hewcedar, ê/a ku kes di hawara wî/ê de neçûye û destê arîkariyê lê dirêj nekiriye. Lewma rûyê wan reş e û heta nikarin ji wê şermazariyê rizgar bibin û xwe bêguneh bikin.

Helbestvan vê helbestê pêşkêşî wan şehîdan dike ku bi destên dijmin û dagîrkeran hatine kuştin. Bi şeweyekî giştî bûyerên trajediyê yê berdewam ên li ser gelê kurd, bandora xwe li ser berhemên afirandina helbestvan kirine, her wekî li ser hemû civakê kirine.

5.6. *Helbesta “Li ser tenûra gundî”*

Di vê helbestê de reng li ba helbestvan derbirîneke sembola û veşartî ye, ne rasterast e. Reng bi şeweyekî tem û mijî nîşa me daye. Lewra jî dibe ku bikaranîna rengê sor di wan cihan da armanc jê aşkerakirina xewn, hêvî û xeyalên helbestvan bi xwe bin. Yan jî dibe ku helbestvan xwestibe asoyeke vekirî li hemberî xwendevan bihêle, ji bo ku xwendevan li gorî hez û armanca xwe û li gorî îdeolojî û têgehiştina xwe raman û delaletakê bide rengê sor di vê beyta helbestê de:

Her careke nanê xwe ji ser tenûrê dibire ve, min

Digotê:

“Te nanek hêlaye bi tenûrê ve”

Wê jî her car digot:

“Hêsta sor nebûye” (Teyib, 2021: 91).

Rengê sor, bi xwe rengê bihêz û germ e û her dema ku me guh lê dibe yekser bandora xwe ya bihêz dike ser derûniya mirov. Delalet û ramana vî rengî ji kesekî bo kesekî cuda ye. Lewra dibe ku helbestvanî bikaranîna rengê sor, di vê helbestê de kiribe delalet ji bo ramanên cuda. Ji ber ku rengê sor bi xwe jî rengên serekî û rengên germ e, dibe ku wek delalet ji bo azirandinê bi kar anîbe yan jî ji bo qurbanîdayînê çimkî rêka gihîştina aşiqan tijî nexweşî û

asteng in. Lewra ji bo vê dozê qurbanîdayîn divê, îcar ew qurbanîdayîn dibe ku bexşandina gîyanê mirov be yan jî jîdestdayîna hindek armancên mirov be.

Di berdewamiya helbestê de, ji nanê germ û tenûreke agirê wê hilbûyî û xatûneke rûyên wê sor, rasterast an nerasterast tabloyeke yekgirtî hatiye çêkirin bi peyv û wêneyan ku di hestên me de xwe dibînin. Huner, hestkirina bi ciwanî û xweşiya hundirîn e. Helbet nimûneyên di xeyala helbestê de bi kar hatine ew bi xwe dîmenên wêneyan in. Lê yekkirina van wêneyan tabloya helbestê dide xuyakirin û bala me dikêşe.

*Nuke jî her careka bêhina nanê gerim dihête min, di
Tenûrê da destekê şor, li ser lêva wê du ruyên
sor, dihêne ber çavên min (Teyib, 2021: 92).*

Saloxdana rûyên wê yên bi rengê sor, amaje ye ji bo bercestebûna hezên evînî û seksê, ku heta niha ew wêne ji ber çavên wî neçûye her dema bêhna nan tê, ew wêne di xeyala wî de berceste dibe. Çimkî rûyên sor yek ji delaleta ciwaniya jinê ye, bi taybetî li ba civaka kurdan, delaleta ciwanî û şermîniyê ye.

Di beyta dumahiyê de helbestvan bi dilekî melûl hestên xwe derbirîne ku ew saloxdan amajeyên nerasterast in. Maweya paşeroja vê eşqê ber bi dereke nediyar ve diçe, ku wek dem an temen derbas bûye yan jî ew kes di jiyana wî de nemaye û bi wê eşqê şad nebûye, bes wek dil her ew eşq e di dilê wî de sax û geş maye û ew hevî li ba wî venemiriye. Lê belê, di realîteyê de hemû tişt derbas bûye û derfet ji bo gihîştin û şadbûna bi wê eşqê ne diyar e. Lewra dibêje:

*Di sîngê min da, girkeka hevîrî heye hêştî tîrîş nebûye.
Bi tenûra gundê me ve, nanek heye sot û kesê jê venekir (Teyib, 2021: 92).*

Encam

Ji serdemên kevin ve ta niha reng xwedan girîngiyê mezîn bûne. Ji dirêjahiya mêjûyê ve mirovan girîngî pê daye. Ji ber hindê jî delalet û raman ji layê, psîkolojî, olî, civakî û gelek biwarên dîtir ve ji bo her rengekî destnîşankirî ne. Reng, gelek caran li ba Mueyed Teyib wek simbol û delalet hatine bikaranîn. Rengvedana kevneşopiyên civakî, olî, ramyarî, îdeolojîk, derûnî, bîrhatin û xewnan di helbestên wî de zal bûne. Hindek caran reng bi şeweyekî tesedîfî bi kar anîne, lê belê nêzikî siruşt û derûniya helbestvan bi xwe ne.

Helbestvan kesên hestnazik in û derûniya wan ji her kesî/ê zûtir di bandorê de dimîne. Lewra jî ji sedema wan bandorên ku li ser derûniya Mueyed Teyib bûne, helbestên wî encam dane. Sedemên derûniyê ji sedemên serekî yên vehandina helbestan in. Bûyerên trajedîk ên ku bi berdewamî bi serê gelê kurd de hatine, bandora xwe li ser berhem û afirandinên helbestvan kirine, her wekî li ser civakê giştî kirine. Helbestvan gelekî ji kevneşopiyên civaka ku tê de dijî dûtir neketiye û gelek guhartin di raman û delaleta rengan de nekiriye. Ji ber ku reng bihayekî estetîkî, bihayekî hunerî yê bilind dide tekstê û ji ber reng yek ji alavên girîng ên afirandina tekstan, bi taybetî jî afirandina helbestê ne, Lewma jî helbestvan Mueyed Teyib pena biriye ser rengan. Di nava seqaya hestî û derûnî ya helbestvaniya helbestvan de, rengê reş ê zal e û zêdetir ji hemû rengên dîtir hatiye bikaranîn di helbestên wî de. Helbestvan rengê reş bi kar aniye ji bo derbirîna hestên xwe yên xemgîrî. Ev jî wê diyar dike ku xembarî di derûniya helbestvan de di asteke ne kêm de ye.

Her reng xwedî raman, felsefe, delaletên xwe yên cur bi cur e. Karekî ne asan e ku mirov bikaribe ji bo her rengî raman an delaleteke dirust û taybet destnîşan bike. Çimkî ev raman û

sembol ne cihgir in li gor kes, çand, ol û hwd. Ev delalet û raman guhêrbar in. Bi şêweyekî giştî raman û delaletên rengan li ba helbestvan Mueyed Teyib bi vî şêweyî ne: Rengê reş delaleta neman û xemgîniyê ye. Sor, delaleta evîni û qurbanîdayîni ye. Şîn, rengê hevî û umîdan e. Rengê spî, delaleta bêgunehî û aştiyê ye. Rengê zer, delaleta nexweşî û lawaziyê ye. Rengê kesk, delaleta jiyân û ciwanîyê ye.

Çavkanî

- Abad, M., & Bîlawe, R. (2012). *Delale el-Lewin fî el-Şî'r Yehiya el-Semawî*. Îran, Meşhed: Camî'e firdusî.
- Balayî, F. (2008). *Cîhana Rengan*. Dihok: Spîrêz ya Çap û Weşanê.
- Ebdilxefûr, E. (2008). *Mîn Sîmat Cemal el-Quran el-Kerîm, el-Elwan we Delaletuha Nemuzucen. el-Micele el-Ordniye fî ed-Dîrasat el-Îslamiye: Meclis el-Xamis. el-'Edede 4*.
- El-Dorî, ' E. (2002). *Delale el-Lewn fî el-Fen el-Erebî el-Îslamî (Vol. 1)*. Bexdad: Dar el-Şûn es-Seqafiye.
- Elî, Î. M. (2001). *El- lewn fî Ş'er el-Erebî qebil el-Îslam*. Libnan: Trablûs.
- El-Mitîrî, E. (2014). *el-Delalet en-efsiye fî Şî'ri el-Tebî'e fî 'Esir el-Endelusî. Rîsale Macisitir. Camiy'e el-Şerq el-Ewset. Kuliye el-Adab wal 'Olum Qism el-Luxe el-'Erebiye we Adabiha*.
- El-Qeran, F. (. (1984). *el-Weşim we'l-Weşî fî Ş'er el-Cahilî*. Suriye: Cam'iye Yermûk.
- El-Sefar, Î. (2010). *Cemaliye et-eşkîl el-Lewnî fî el-Quran*. Ordun, Oman: Alem el- Kutb el-Hedîse.
- El-Yaqût, Ş. (2018). *Me'anî el-Lewin fî el-Luxe we'l-seqafe we'l- Fen*. Cezayir: Koliye el-Adab. Qism el-Finun.
- EL-Zewahîre, Z. H. (2008). *el-Lewin we Delaletuha fî el-Şe'ir (Vol. 1)*. Oman: Dar el-Hamid.
- Fethî, Î. (2022, 01 5). *Maza Ye'nî el-Lewn el-Ehmer*. Retrieved from mawdo': https://mawdoo3.com/ماذا_يعني_اللون_الأحمر/
- Hemdan, E. (2008). *Delalat el-lewin fî Şî'iyar Nîzar Qebanî. Rîsale Macisitir. Nablîs. Felestîn: Camî'iye el-Necah el-Wetenye*.
- Me'abîre, T. (2022, 01 12). *Delalat el-Lewn el-Ebyed*. Retrieved from Mawdo': https://mawdoo3.com/دلالات_اللون_الأبيض/
- Muhsin, R. (2017). *Delaletên Rengan di Huzanên Nû Nûxazên Kurdîda, Devera Behdînan*. Dihok: Nama Masterê. Zankoya Zaxo.
- Muxtar, U. E. (1982). *el-Luxe we'l-Lewin. Qahîre: Alem el-Kutib we'l-Neşir we'l-Tewzî*.
- Narmîn, M. E. (2006). *Tewzîf el-Lewn fî Ş'er İbin el-Rumî. Qahîre: Doktora: Camiy'e el-Zeqazîq*.
- Nihêlî, N. E. (2005). *Pêlên Rexneyî*. Dihok: Spîrêz ya Çap û Weşanê.
- Şukrî, E. W. (1985). *el-Îzaye we'l-Mesrehiye*. Qahîre: el-Heiye el-Misriye Lîl kîtab.
- Telal, W. (2022, 01 12). *Maza Ye'nî el-Lewn el-Eswed*. Retrieved from Mawdo': https://mawdoo3.com/ماذا_يعني_اللون_الأسود/
- Teyib, M. (2012). *Piling Dema Birsî Dibin, Mîrov dema têr Dibin*. Dihok: Spîrêz ya Çap û Weşanê.

- Teyib, M. (2014). Ne Ba Min Siwar Dike.. Ne Ax Min Peya Dike. Çapa Yekem. Stembol: Avesta.
- Teyib, M. (2021). Destê Min Behî, Qelemê Min Şîn ma. Çapa Êkê. Dihok: Spîrêz ya Çap û Weşanê.
- Ubeyd, K. (2013). el-Elwan we Dewruha, Tesnîfuha, Remziyetuha we Delaletuha (Vol. T1). Bêrût: Muesese el-Cam'iye, Lîl-dîrasat we el-Neşir we'l-Tewzzî.
- Xanikî, K. (2011). Felsefe û Delaletên Rengan û Praktîzekrin li ser Civak û Teksitên Êzdiyan. Dihok: Çapxana Hewar.

ئەدەبیاتی کوردی وەک بناغەییەکی بە ستانداردبوونی زمانی کوردی

(KURDISH LITERATURE AS A BASIS FOR KURDISH STANDARDIZATION)

Safya MUHAMMAD AHMAD*

Soran ABDULRAHMAN HAMAD**

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî

Received // Hatîn: 05.01.2022

Accepted // Pejirandin: 07.04.2022

Published // Weşandin: 30.04.2022

Pages // Rûpel: 64-75

DOI: 10.55106/kurdiname.1053202

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0). <http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Muhammad Ahmad, Safya and Abdulrahman Hamad, Soran (2022). ئەدەبیاتی کوردی وەک بناغەییەکی بە ستانداردبوونی زمانی کوردی *Kurdiname*, no. 6, p.64-75

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêrî aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Abstract

Ev peyva erebî du peyvên watecûda li xwe digire: 1. Razîbûna ji rewşa xwe, têr bûn û gili nekirin. 2. Bîr û baweriyên li ser tiştêkî an jî rûdanekê. Wateya ku zêdetir helwestê re eleqedar e helbet wateya duwemîn e lê qenaet rewşeke helwestê ya fikrî û hestî îma dike loma nabe ku sedîsed wekî helwestê bê nirxandin çunkî aliyê helwestê yê kiryarî jî heye.

Ev peyva ku di kurdî de bi şiklê; ‘qanî bûn, îqna bûn, îqna kirin’ jî bi kar tê, ji bo pejiwandin tiştêkî pêlikeke girîng e û têkiliya zexm bi helwest û kiryarê re nîşan dide. Îro xusûsen di sektora kar û xizmetê de, di çarçoveya têkiliyên firoşkar-bikir a dan-standin û kirîn-firotinê de tesîrkirina li ser wan; balkişandin, beralîkirin, guherandina helwesta wan û îqnakirina wan belkî karê herî girîng û jêneger e.

Li gorî Kolasa û Rokeach; “qenaet îfadeyên zarî yên helwestê ne. Qenaet helwestan durist nakin, ew zêdetir eksa helwestan in. Li gorî helwestan qenaet, bêtir cureyîn in; di nava demeke kifşe de, raveya kesan a di derbarê bûyer, kiryar û mijarên diyarkirî de nîşan didin. Kes, di derbarê rastiyên bûyerê de ji xwe tiştan tevlê dike û wisa qenaeta xwe diyar dike.” (Tavşancıl, 2018: 75).

1.2.3. Ajo

Wateya ajoyê di ferhengê de: 1. Rewşa hişyarbûneke fîzyolojîk an jî psîkolojîk e ku berê takekes dide hedefekê, 2. Ew sebeb e ku wekî wate an jî boneya kiryara kesekî hatiye nîşandan (Apa Dictionary, 2019). Helwest ji gelek aliyên ve wekî ajoyê ye lê ferqên wan ên girîng hene.

Ferqa pêşîn belkî jî maweya demî ye. Hêza ajoyekê pêbendî rewşa ajotinê (berdewamiyê) ye. Loma ajo dertên, winda dibin, dîsa dertên. Helwest bi rewşeke wisa re karaktîze nîne lê ew tenê ihtîmala hişyarbûna ajoyeke kifşe îfade dike (digel hêza ajotinê ya pê re). Loma, merivek dema televîzyonê temaşe dike, dibe ku nekare malbata xwe biparêze lê dibe ku ew bibe xwedî helwesteke parêzvan digel malbata xwe, bo nimûne; dema bulteneke keşûhewayê behsa bahozeke dike di herêma wî, di cî de ajoyên wî merivî hişyar dibin (Newcomb, Turner & Converse, 2015: 42).

1.2.4. Nirx

Nirx ew peyv e ku hemî qîmet û hêjayên kes an civakan diyar dikin, çi maddî û çi manewî bin. Ji nirxên maddî wê de, dema kes û civak bi nirxên xwe, xwe îfade dikin piranî mebest jê nirxên manewî ne ku ew jî bîr û bawerî, hezkirin, hezkirî û nêzîkên wî ne yên wekî; bawerî, dîn, milliyet, welat, malbat û wd.

Nirxên civakê ji bo ku helwest çêbin an jî bikemilin kartêker in. Bo nimûne; Millon û Lerner (2003: 308) ji Rokeach (1973) diguhêzin; bi qasî ku ew derdibirre, di bin helwestan de rêzenirxên civakê yên bi nisbet biçûk hene. Dîsa li gorî teoriya Rozenberg însan wisa dikin ku helwest û nirxên wan ji hev bigirin.

1.2.5. Norm

Norm qaîde û pîvanên civakî îfade dikin ku kes ji bo jiyaneke aram û asûde bi wan qaîdeyan ve girêdayî ye/divê girêdayî be û li gorî wan tevbigere.

Di derbarê norman de teoriya Parsonî wiha dibêje (Marshall, 2005: 534):

“Norm, eksa baweriyên kesên ên têkilî kar û peywîrên wan e û bi rêya civakîbûnê bûye parçeyeke motîvekirina însanan û loma ji ber ku însan dixwazin li civakê werin, ew bi wan norman ve hevaheng dibin.’ Lê li gorî teoriya nasnameya civakî jî terîfa norman wisa ye: ‘norm (ji baweriyên şexsî wêdetir), îfadeya wan têgihîştinan e ku, ka kîjan çalakî ew ê nasnameyên din bi însanên mayî bide pejirandin. Loma wisa tê hizirkirin ku însan bi norman re hevaheng dibin ji bo ku nasnameyên xwe yên diyar hem bi xwe hem jî bi însanên din bidin pejirandin.”

1.2.6. Îdeolojî

Wekî wateyeke berbelav jêre ‘dêna dinyayî’ tê gotin ku ew dên e; derbarê heyîn, terîfkirina sekna xwe û yên din, qanûnên jiyana civakî, rêvebirina kar û kiryarên civakî nîşan dide. Ji bo ku sê aliyên helwestê (zihnî, hestî û kiryarî) hene, îdeolojî ji helwestê cudatir ew zêdetir zihnî û fikrî ye. Yanî ew belkî helwesteke fikrî ye. Hogg û Vaughan (2014: 189-190) vê derbarê de wiha dibêjin:

“Îdeolojî, îşaretî sîstemeke baweriyê ya tevahî dike ku berbelav tê parvekirin; bi giştî, xaleke referansê ya siyasî yan jî sosyal e ku xwedî karjeniyeye xuyaker e (Thompson, 1990). Ji bo me îdeolojiyên herî nas îdeolojiyên dînî û yên sosyo-polîtîk in ku ew dibin jêderê gelek pevçûnan ên navbera grûpan... Bilig (1991), îddia kiriye ku di nav jiyana rojane de, para bêtir a çalakîyên me yên fikrî ji nakokiyên/herênayên me yên îdeolojîk dertên. Bo nimûne; mamoste, ji aliyekî ve dixwazin otorîteya xwe saz kin ji aliyekî ve jî dixwazin wekheviya xwe û ya xwendevanê xwe saz bikin...”

Her însanê ku xwedî îdeolojiyekê ye, ew xwedî hin helwestan e ku dema ew xwe îfade dike yan jî şûna xwe diyar dike (nm; di siyasetê de partiya xwe, di akademyê de ekola xwe, di bazarê de bazirganiya xwe û ww.) û bi vî awayî ew helwesta xwe nîşan dide.

Lêkolîneran di nav helwestên siyasî de herî kêr du rehendên îdeolojîk ên cuda dîtine: Helwestên li dijî sazûmanên exlaqî yê eleyhê azadiya takekesî de û helwestên dijî dilovaniyê yê eleyhê reqabetê de (Ashton, Esses û Maio, 2001; Boski, 1993 vghz. Millon û Lerner 2003: 308)

1.2.7. Têmsîlên Civakî

Psîkologên civakî ji ber aliyê însan ê civakî ew wekî perçeyekî ji civaka wî dîtine û di kiryar û helwestên însan de rola civakê ya li ser wî derbirrîne.

Li gorî Moscovici (1983), baweriyên însanan bi awayekî civakî însa bûne; yanî tiştên ku dibê hevîrê fikr û ramanên însan ew tişt in ku însanên din baweriyên xwe pê anîne û ew gotine. Dema em vî aliyê ve lê binêrin, em dibînin ku helwestên kesên ji aliyê endamên civatê yê din ve jî tîr parvekirin. Ji aliyê perspektîfê helwestî xala girîng ev e: çarçoveya helwestên spesîfîk ji aliyê binyadên temsîlî ve tîr xêzkirin, binyadên temsîlî jî hîmê xwe di nav grûpên civakî de danîne. Bi vî nêrînê helwest, bi awayekî civakî ava bûne û bûne eksa civaka însanan an jî grûpên wan ku ew jiyana xwe tê de dijîn (Hogg û Vaughan, 2014: 190).

1.3. Hêmanên Helwestê

Bi qasî ku zanyarên biwara psîkolojiya civakî ser xebitîne û ronî dane ser, sê aliyên helwestê hene ku însan dikare bi hestên xwe, bi fikr û ramanên xwe û bi kir û tevgerên xwe ve bibe xwedî vî hêmanê. Modela ku ev hersê pêkhatyên helwestê rave dike wekî; ‘modela sê-hêmanî ya helwestê’ hatiye binavkirin.

Li gorî ‘modela sê-hêmanî ya helwestê’ ya Rosenberg û Hovland (1960) hêmanên helwestê wiha kategorîze dibin:

1. Hêmana îdraqî/hîşî (fîkr û raman): Baweriyên di derbarê objeyê helwestê de ye.
2. Hêmana hestiyarî (his): Hestên erênî yan jî nerênî yê tîkilî objeya helwestê.
3. Hêmana kiryarî (kar û tevger): Rewşa ber amadebûna tevgerê.

Li aliyekî din digel van hersê hêmanên sereke, ev model hin xusûsiyetên din ên helwestê wiha derdibirre (Hogg û Vaughan, 2010: 94):

“ (1) Helwest bi nisbet mayînde ne: Yanî, ew bi dirêjîya rewş û dema re berdewam in, hisên lehzeke nabine helwest. (2) Helwest bi bûyer û objeyên girîng ên sosyal ve sîndar in. (3) Helwest gelemper in: Eger tu kitêbekê ser tiliya xwe bigirî û te biêşîne, ev tîrê nake wê bike helwestekê, çûnkî ev bûyereke yek cî û yek car e. Lê eger ev tecrube bike ku tu ji kitêb û pirtûxaneyan aciz bî yan jî xwe şehetî his bikî hingê ev acizî dibê helwestekê.”

1.4. Teoriyên Serekî yê Tîkilî Helwestê

Wekî sehayeke xebatê û pêkhatyê girîng a psîkolojiya civakî, di tîkilî helwestê gelek model û teorî hatine pêşxistin. Çawa ku Mostyn (1978: 21) diyar dike; “Grenwald û yê din wê

texmînê dikin ku di dawiya 1960an de ji teoriyên fêrbûnê an jî S-Rê¹ heta teoriyên motîvasyon û neliheviyê bi qasî 34 xebatan têkarî pêşketina teoriya helwestê kirine. Her teoriyên têkilî mijarê bi qasî şeş hebên li jêr tesîr li ser çalakîyên lêkolîn û fikirandinê yê psîkologên civakî nekirine ku ew jî ev in: ‘Teoriya Fêrbûnê, Teoriyên Fonksiyonel, Teoriya Neliheviya Hişî, Teoriya Xwe-têgihandinê, Teoriya Daraza Civakî, Teoriya Lêbarkirinê (attribution)’.”

1.5. Helwest û Kiryar

Li ser helwestê, di sehaya psîkolojiya civakî de gelek xebat hene ku xwestine pêwendîya helwest-kiryarê diyar bikin û bersiva hin pirsên wiha geriyane; ‘ev têkilî heta ku derê dirêj dibe yan jî heta çî astê dertê, gelo raste rast pêwendîya wan dikare bê pîvan?’ Îja di hin xebatan de pêwendîya helwest û kiryarê hatiye çespendin lê di hinekan de pêwendîyeke qels derketiye û di hinekan de jî pêwendîyek tesbît nebûye.

Gelek terîfên helwestê hene ku pêwendîya helwest û kiryarê dihewînin lê ew dikare sist be û berê wê her ku de dibe bila bibe. Wekî wê, terîf hene ku dibên; helwest rewşa amadebûna hilberîna tevgerê û pêkanîna berîdanê ya takekesî ye ku wî ji kiryarê re amade dike. Li aliyekî din hin terîf jî hene ku helwestê wekî şekilandin, dîkte kirin û sedema kiryarê dibînin (Mostyn, 1978: 67).

Hatiye çespendin ku belgekirina pêwendîya bihêz a navbera helwest û kiryarê de ya farazî, carna dijwar e. Bo nimûne, Wicker (1969) 30 xebat vekolan ên ku lihevgerîna helwest-kiryarê ezmûnandine, û ew encam jê girt; “pir hindik delîl hebûn ku destekê bidin hebûna farazî ya helwestên binyatî û biryardar ên di hundirê takekes de yê ku tesîrê hem gotinên wan hem jî tevgerên wan bikin.” Qe nebe ji wê vir de, lêkolîneran gelek faktor diyar kirine yê ku bandorê lihevgerîna helwest-kiryarê dikin, û encama guncaw wisa xuya dike ku; hinek pîvanên pêwendîya helwest û kiryarê di hin rewşan de têkiliya nêzîk nîşan didin lê di henekan de ne wisa (Millon û Lerner 2003: 314-315).

Li aliyekî din Hogg û Vaughan (2010: 103) du teoriyên derbarê têkiliya kiryar û helwestê de wiha derdibirrin:

“Teoriya Çalakiya Mantiqî (theory of reasoned action) a ku Martin Fishbein û Icek Ajzen (1974) pêş xistine, pêda dikeve ka bi xusûsî niyet û baweriyên kesekî bi awayekî krîtîk çawa daxilî kiryarê wî dibin, û teorî van pêkhatayan dihewîne: (1) *Norma subjektîv* – encama dêna takekes a têkilî baweriyên kesên din e. Kesên girîng derbarê ‘kirina tiştê rast’ de rêberiyê dikin. (2) *Helwestên têkilî kiryarê* – xwe dispêre baweriyên takekes ên derbarê kiryarên kifşe û nirxandina wan kiryanan. Ev ne helwesteke beralî heyberekê ye (nm. dermanê kontrola ducaniyê), lê ew beralî kiryarê ye (nm. xwarina derman). (3) *Niyeta kiryarî* – beyana ji nav (hundir) a berew tevgerê ye. (4) *Kiryar* – çalakî li dar e. Ajzen (1989) berdewam kir li ser rola viyanê di modeleke guherandî de ya teoriya kiryara plankirî (theory of planned behaviour). Kontrola kiryarî ya têgihîştî bi qasî jêbawerîya takekes e ka jêre pêkanîna çalakîyê dijwar e yan hêsan e. Dema biryarê, em tecrubeyên bihurî û astengên mewcud difikirin. Bo nimûne; Ajzen û Madden (1986) tesbît kirin ku xwendevan, ne surpîz e, dixwazin di dersên xwe de nota Ayê werbigirin: Xwendevan notên Ayê berz dinirxînin (helwest), û ew notên wisa ne ku malbat û hevalên xwendevanan dixwazin ew bi ser kevin (norma subjektîv). Digel vî, pêşdîtina nota Ayê,

¹ **Stimulus-response theory/teoriya ‘hişyarker-bertek’ê:** Di psîkolojiyê de têgehek e ku li gorî wê, wisa tê bawerkirin ku kiryar di encama hevtesîrkirina hişyarker û bertekê tê der.

eger em nepîvin ka xwendevan dê şîyanên xwe çawa binirxîne ew ê bawerî pê nebe. Herdu teorî; teoriya çalakiya mantiqî û teoriya kiriyara plankirî ne di pevçûnê de ne.”

Wekî ji teoriyên li jor diyar dibe di sepandina kiriyara kesan de hin pêlik hene û kes, pêbendî hin rewşên ji xwe û hinên ji derî xwe ye. Dîsa hin xebatên vê biwarê di navbera helwest û kiryarê de têkiliyêke xurt dîtine xusûsen di hin rewşan de.

Ev lîsteya li jêr kurteya fakterên ku pêwendiyêke bihêz a helwest û kiryarê pêk tînin nîşan dide (Stangor, 2011: 244):

- Dema helwest ne qels, lê bihêz bin
- Dema niyeteke me ya bihêz hebe ji bo ku em tiştêkî bikin.
- Dema helwest û kiryar herdu jî ji heman rewşa civakî der hatin.
- Dema em gihîştine heman pêkhatiyên helwestê (tesîr an jî îdraq) wextê helwest hat nirxandin an jî dema kiryar pêk hat.
- Dema helwest ji asteke gelemper zêdetir di asteke xusûsî de hate pîvandin.
- Ji bo xwe-temaşekirina qels (ne ji bo xwe-temaşekirina berz)

1.6. Guherîna Helwestan

Wekî ku tê zanîn însan razî dibe fikrên wî biguhere. Rastiya ku dibêje; heye ku helwest û kiryar ji hev negirin, encameke firawan derdixê û yek ji wan sedemên bihêz e ku dihêle însan helwesta xwe biguherin. Teoriya neliheviya hişî/zanînî yek ji teoriyên malbata teoriyên lihevgerîna hişî ye. Ev teorî ferz dikin ku însan dixwaze bawer bike; dema ew hîs dikin, difikirin û tevdigerin, ew di van rewşên xwe de lihevgerî ne. Li ser vê faraziyê herî zêde teoriya neliheviya hişî xebitiye ku psîkologê civakî Leon Festinger (1957) ew pêş xistiye, û di psîkojiya civakî de bûye ew babet ku herî zêde xebat ser çêbûne di dirêjîya salên 1960an de (Hogg û Vaughan, 2010: 105).

Çawa ku Kuppuswamy (1961: 206) derbirriye di çêbûn û guherîna helwestan de hem fakterên navîn hem jî yên derîn cihê xwe digirin. Fakterên hundirîn amaje bi armanc, îdeal û ên wekî wan ê takekes dikin. Fakterên derîn jî amaje bi tecrube, têkiliyên takekes bi kesên mayî re û yên wekî wan dikin.

Wekî ku me berê amaje pê kir; nabe ku herdem helwest kiryarê derîne. Mumkîn e ku carna helwesta kesekî bibe kiryar, carna nebe û carna jî helwest dikare biguhere. Ev rewş jî bi dehsalên sedsala borî hatine vekolan û di encama van lêkolînan de jî hin teorî hatine pêşxistin ku me berê behsa wan kiribûn.

1.7. Hin Kardayên ku Tesîrê li Çêbûn û Guherîna Helwestê Dikin

Di însan de hin xusûsiyet û rewşên navîn û derîn hene ku tesîrê li helwestên wan dikin. Psîkologên civakî balê dikişînin ser kardayên wekî; sal, kesayet, dorwarê perwerdeyê, karlêkkirina çandî, dêwbav û serkeftina akademîk ku bi van, helwesta kesan tesîra xwe digire.

Bi qasî ku psîkologên civakî dane pêş, helwest di zaroktiyê de ne diyar in. Li gorî Brown (2000) ew zarokên ku hişê wan negihîştî ne; li hemberî nijad, çand, grûpa etnîk, çîn û zimanan ne xwedî helwesteke kifş in (McNamara, 1975: 79 vghz. Kazazoğlu, 2011: 29).

Ji bo ku temenê însan girîng e di çêbûn û guherîna helwestan de, lêkolîneran dema li ser helwestan pîvanekên xwe saz kirine û sepandine wan zêdetir li salên balixbûna zarokan û pêrava dane ber xwe. Çûnkî ji lêkolînan têderketiye ku zarok zêdetir ji dêwbavê xwe tesîrê digirin û

her ku diçe mezin dibe helwestên wan dikare ji yê dêwbavê wan cudatir be. Vê derbarê de Hogg û Vaughan (2014: 187) hin encamên lêkolînan wiha diguhêzin:

“Connell (1972) xuya dike ku di hin mijarên *spesîfîk* de, di navbera helwesta zarokan û ya dêwbavê wan de korelasyon (têkilî/girêdan) piranî pozîtîf be jî, ew heman demê de qels e. Dema mijarên *gelempêr* tên pîvandîna korelasyon xurttir e. Jennings û Niemi (1968), derbarê tercîhkirina partiyeke siyasî de, tercîhên xwendevanên lîseyê û yê dêwbavê wan daye ber hev û korelasyon wekî; 0.60, lê di derbarê dînê de, tercîhên wan daye ber hev û korelasyon wekî; 0.88 dîtine. Tabî kiryarên bereks dikare bikeve ber van korelasyonan, ev jî xusûsiyeta balixbûnê ye ku zarokên vê serdemê piranî eksê dêwbavê xwe helwestan dihebînin an jî wisa dixuyên.”

Li aliyekî din derdor, medya û xusûsen televîzyon û -îro zêdetir medyaya civakî- kartêker in li ser çêbûn û guherîna helwestan. Bi qasî ku Hogg û Vaughan (2014) diguhêzin medya û xusûsen televîzyon hin ji faktorên sereke ne yê ku tesîrê li helwestan dikin. Di gelek lêkolînan de hatiye sepandin ku berîdanên medyayê û televîzyonan û teşwîqên reklamandî di çêbûna helwesta însanan de roleke girîng lîstine.

1.8. Pîvandîna Helwestan

Psikolojiya civakî, ev bi qasî sed salî ye ku li ser helwestê xebatan dike, têkiliya helwest û kiryarê dipêve û dixwaze tercîh û sebebên terciha însan ên pêbendî helwestê rave bike. Prosesa pîvandîna helwestê ya ku ji sala 1925an vir de berdewam e, heta niha bi gelek pîvanekan bûye sehayêke lêkolînê.

Pîvandîna helwestan ne ewqas hêsan e, çunkî raçavkirina helwestan bi awayekî rasterast ne mumkîn e. Tiştê di zêhna kesekî de em ê çawa bipîvin? Bi giştî çare ew e ku meriv pirsan li kesa bike. Lêkolîner bi giranî piştê xwe didine vê stratejiyê û dupayî, ew anket û pîvanekên helwestê bi kar tînin (Hogg û Vaughan, 2014: 191).

Raçavkirina helwestên kesên rasterast ne mumkîn e. Thurstone (1929) îfade dike ku helwest dikare bi rêya qenaetan bê pîvandîna ku qenaet îfadeyên zarî yê helwestan in. Hinekan jî gotine qenaet her gav helwestan îfade nakin, gotin û kirinên însanan dibe ku ji hev cuda bin. Lê qenaetê berbelav heye, kiryarên kesên ji helwestên wan ên xasî wan dertên. Pîvandîna helwestan xwe dispêre vê bingehe (Özgül, 1994 vghz. Köklü, 1995: 86).

Ji bo ku rehendên fîzîkî yê helwestan tunene, bi gotineke din ji bo ku ew têgehên razber in, pîvanekkirina wan heta heye dijwar e. Wekî berê jî hate diyarkirin, helwest guherbarên veşarî yan jî farazî ne. Ji ber wê helwest rasterast nayêne pîvandîna. Dema ku ji kesên helwesta wan a têkilî obje an jî mijara helwestê hate pirsîn, piranî ew nikarin bibersivînin, ew îfadeyên çewt an jî yê serva didin. Loma ji bo ku merî helwestên kesên hîn be divê merî agahiyên derbarê fikrên wan, hestên wan û meyla bertekên wan hîn be (Thurstone, 1967: 78-79 vghz. Tavşancıl, 2018:101).

Ji aliyê pîvandînê ve hin rehendên helwestê girîng in. Ji van rehendan; alî, derece û sift ji bo pîvandîna helwestê pir girîng in. Aliyê helwestê; aliyê hestiyarî ye yê wekî jê xweşbûn, jê xweşnebûn, pozîtîf an jî negatîf bûn. Dereceya helwestê; asta hestiyarî ya pejirandin an jî redkirina helwestê nîşan dide. Siftbûna helwestê jî; ihtimala veguherîna bo kiryarê, rewşa bihêz an jî qelsbûnê ye, ya di nav qadên din ên helwestê de îfade dike (Kazazoğlu, 2011: 42).

Di pîvandina helwestan de hin teknîk, rê û rêbaz hatine pêşxistin ku zanyaran pîvanekên helwestê li gorî xusûsiyetên wan tesnîf kirine û navandine. Ji van, rêbazên wekî; raçav, lîsteyên pirsan, risteyên netemam û vegotina çîrokên û teknîkên wekî; bijartina çewtiyê, analîza naverokê bi kar tên.

Wekî encam xebatên têkilî helwestê dikarin sê kategoriyan de werine ser hev. Ew, wekî li jêr in (Arul, 2002; Anderson, 1988 vghz. Tavşancıl, 2018: 101): “(1) Rêbazên ku dihêlin merî ji kiryarên kesan wateyan derxe. Di vê de, divê merî daneyan berhev bike yê ku xwe dispêrine raçavkirinê ji bo têkiliya helwest-kiryarê saz bike. (2) Rêbazên ku dihêlin merî wateyan derxe yê ku xwe dispêrine bertekên kesan ên fîzyolojîk. (3) Rêbazên ku dihêlin merî wateyan derxe ji yê ku xwe dispêrine bertekên kesan ên ku dane rêzeke îfade/madde an jî sifetan.

1.9. Pîvanekên Helwestê

Pîvanekên helwestê di serê salên 1930yî de hatin pêşxistin û ji bo fikrên serekî yê însanan bipîvin ên wekî; siyasî, dînî û nijadî hatine bikaranîn. Ev pîvanek anket/pirsname bûn ku ji însanan dipirsîn ka ew di derbarê van mijaran de çi difikirin, çi hîs dikin û di van rewşan de çawa tevdiagerin. Xebata pêşîn a helwestên nijadî Richard LaPiere (1934) çekir ku bi wê xebatê têderket; gotin û tevgerên însanan bi awayekî berçav ji hev nagirin (Hogg û Vaughan, 2010: 100).

Pîvanek ew lîsteya bertekên însanan ên ji hestên wan ên rasteqîn e dema rêzepirsên wekî riste an sifet ji wan tê pirsîn nişan didin. Pîvanekên herî zêde tên bikaranîn yê; Likert, Thurstone, Guttman û ‘pîvanekên wateya hestiyar’ in. Pîvanekên Likert, Thurstone û Guttmanî risteyan dihewînin, ‘pîvaneka wateya hestiyar’ jî ji rêzesifetên nîrxandinê yê du niçî pêk tê (Köklü, 1995: 87 vghz. Kazazoğlu, 2011: 44).

Dema lêkolînerê bixwaze di mijarekê de helwesta kesan hîn bibe, ew pirsên têkilî mijarê amade dike û wan li ser nimûneyên bijartî dispêne. Ev pirs dikarin bi şiklê risteyan bin ku zêdetir wekî anket tên zanîn. Ji bo têbarî û pêbaweriya pîvanekê xurt be divê maddeyên pirsan xwedî hin xusûsiyetan bin ku zanyaran ew diyarkirine.

Bi qasî ku Tavşancıl (2018: 114-115) diguhêze Edwards (1957) ji bo nivîsandina maddeyên pîvanekên helwestê hin qayde pêşniyar kirine. Ev qayde dikare wisa bêne rêzkirin:

- 1) Risteyên ne ji dema borî, lê divê zêdetir risteyên dema niha bi kar bên.
- 2) Divê merî xwe ji îfadeyên ravekirina bûyerên rasteqîn, an jî raveyên xwe dispêrine wan bûyeran bigire.
- 3) Divê merî xwe ji îfadeyên ku raveyekê zêdetir dixwazin bigire.
- 4) Divê merî xwe ji wan maddeyên helwestê bigire, ew ên eleqe bi mijara berdest a psîkolojîk re tune.
- 5) Divê îfadeyên ku herkes dikare bipejirîne yan jî tu kes wan napejirîne bi kar neyên.
- 6) Divê risteyên wisa bên bijartin ku ew riste ranja sehekî ya pîvaneka mijarê bi tevayî vegirin.
- 7) Divê îfade eşkere, hêsan, vebirî û rasterast fehmar bin.
- 8) Divê madde kurt bin (herî zêde 20 peyv).
- 9) Divê di maddeyan de îfadeyên gelemper ên wekî; ‘hemî, herdem, tu-yek, qet’ ên ku bersivdaran berew nediyariyê dibin, nebin.

- 10) Divê her maddeyeke pirsê tenê fikrekê bihewîne.
- 11) Dema peyvên wekî; ‘tenê, her, yek’ bi kar hatin ew bi qaydeyekî bi kar bîn.
- 12) Mumkîn be divê madde ne wekî risteyên kompleks an jî hevedanî lê wekî risteyên basît bi kar bîn.
- 13) Peyvên ku bersivdar dê fêm nekin divê bi kar neyên.
- 14) Divê du îfadeyên nerênî di heman maddeyê de bi kar neyên.”

Li aliyekî din wekî ku Hogg û Vaughan (2014: 191-192) diyar dikin; teknîkên pîvandina helwestan pêşbînîyên cuda dikin di derbarê maddeyên testê an jî kalîteya daneyên berhevkerî de û di derbarê helwesta kesekî de ka ew agahiyên çî terî ne. Ev teknîk heman demî, di van faraziyên de hevpar in: “ (1) Helwest bi teknîkeke kantîtatîv dikarin bîn pîvandî; bi vî awayî fikra kesekî bi nirxeke jimarî tê temsîlkirin. (2) Maddeyeke testê ya kifş an jî kiryareke ku helwestekê dinîşe, ji bo hemî bersivdaran xwedî heman wateyî ye, wisa ku bersivê ji bo her kesekî bi heman şiklî tê pûankirin.

Ev farazî ne mumkîne hercar xwe rast biderin. Divê merî bi îhtiyat be ji faraziyeyên girtî re. Ji bo ku em muhtewaya pîvanekên helwestê fêm bikin, em ê çend hebên sereke li jêr pêşkeş bikin.

1.9.1. Pîvaneka Mesafeya Civakî ya Bogardus

Ev pîvanek wekî pîvaneka pêşîn a helwestê tê zanîn û di sala 1925an de hatiye sepandin. Ev pîvanek bi wê mebestê saz bûye ku têkiliyên însanan bide ber hev ka ew kesên ji dîn, nijad û çînên cuda çiqas qebûl dikin an red dikin. Li gorî mantiqa pîvanekê ya bingehîn wate ev e; “eger ez bi we re jiyana di heman taxê de qebûl bikim, ew tê wê maneyê ku ez jiyana di heman bajêrî û welatî de jî qebûl dikim.” Bogardus di sala 1926an de pîvaneka xwe li ser 1725 xwendevanên Amerîkî yên esil-Ewropayî sepandiye yê ji 24 zanîngehên wî welatî. Û wî di 1936an ne tê de ku hingê dervayî welêt bûye, her deh salan carekê (1946, 1956 û 1966) tekrar kiriye (Nix, 1993; Arul, 2002 vghz. Tavşancıl, 2018: 114-115). Di rapirsîna Bogardus a 1926an de, belavbûna pîleya têkiliyên Amerîkiyan digel grûpên etnîk li gorî sedeyên wan wekî tabloya li jêr ê:

**Tablo 1.1: Helwestên Amerîkiyan
li dijî Hin Grûpên Etnîk – wekî ‘Qebûl Dikim’**

	Bi zewacê wekî eqreba (%)	Wekî dostekî teví kulûba xwe (%)	Wekî cîran li taxa xwe (%)	Wekî heval-kar li welatê xwe (%)	Wekî hewlatî li welatê xwe (%)	Wekî mévan li welatê xwe (%)	Divê ji welat bé derxistin (%)
Amerîkî	90	92	93	92	91	1	0
Kanadayî	87	93	96	96	96	2	0
Îskoç	78	89	91	93	93	2	0
Îrlandî	70	83	86	90	91	4	1
Gallî	61	72	80	81	86	5	0
Fransewî	68	85	88	90	93	4	1
Îngiliz	94	97	97	95	96	2	0

Îskoçên	73	82	88	89	92	17	0
Îrlandayî							

Jêder: Tavşancıl, 2018: 118

1.9.2. Pîvaneka Guttman

Ev pîvanek, Guttman û hevalên wî di heyama II. Şerê Cîhanê de ji bo helwestan biçespînin pêşxistine. Taybetiya berçav a vê pîvanekê ew e ku dema kesek ji rêza risteyan risteyekê dibersivîne, bersiva kesî dihêle ku merî derbarê pirsên din de jî bibe xwedî fikrekê. Bi vê wateyê ew û pîvaneka Bogardus xwe dispêrin heman faraziyeyê (Tavşancıl, 2018 û yd. Vghz. Kazazoğlu, 2011: 47).

Tablo. 1.2: Nimûneyeke Pîvaneka Guttman

Madde	Bersiv
1. Ez ji 80 kîloyî zêdetir im.	Erê / Na
2. Ez ji 60 kîloyî zêdetir im.	Erê / Na
3. Ez ji 40 kîloyî zêdetir im.	Erê / Na

Di vê pîvanekê de dema kesek ji madeya yekem re bersiva “erê” bide, eger ne ji bêdîqetiyê be divê ji herdu madeyên duyem û sêyem re jî bersiva “erê” bide. Kesê ku ji her maddeyê re “erê” bêje û hingê 1 puanî bistîne, dema ku 2 puan standibe teqez diyar dibe bê kîjan herdu maddeyê re “erê” gotiye. Ne mumkîn e kesek ji madeya yekem re “erê” bêje, ji madeya duyem re “na” bêje, ji madeya sêyem re “erê” bêje (Tavşancıl, 2018: 157).

1.9.3. Pîvaneka Wateya Sehekî ya Osgood (Pîvaneka Cudatiya Semantîk)

Pîvaneka wateya sehekî ya ku Osgood, Suci û Tannenbaum (1957) pêş xistine dihêle ku di pîvanekê de helwestên cuda bêne pîvandin û xusûsen jî pîvanekê gunçaw e ji bo pîvandina helwestên sosyal. Di bingeha wê de, lêkolîna nîrxên watedar ên derbarê helwestên kesan heye. Ango, armanca esil pîvandina mijara têkil a helwestê ye ku dixwaze tê derxe ka ew ji bo kesî tê çî wateyê. Ji bo vê pîvanekê cure sifetên kifş ji gelek sifetan hatine dariştin. Bi rêya vê pîvanekê, merî dikare nîrxdana çandên ciyawaz ên ku didine bûyer, obje û têgehan berawird bike. Pîvaneka wateya sehekî, ji ber ku ewledar e, sepandina wê hêsan e, ji bo pîvandina berawirdî ya navbera çandan gunçaw e û ji bo azmûnberan balkêş e, ew gelekî berbelav bi kar tê. Lê pêşxistina pîvanekê ne hêsan e. Ji bo ku rehendên watedar di vê pîvanekê de bêne pîvandin divê sifetên têkilî gelek têgehan bêne berhevkirin, ji pêş-testekê re bêne derbsakirin û analîza fakterî bê kirin (Tavşancıl, 2005: 169 vghz. Kazazoğlu, 2011: 48).

Nimûneyeke pîvanekê ya têkilî pîvandina ‘jihevkirina watedar a têkilî mêran’ wekî li jêr e:

Tablo 1.3: Nimûneya Pîvaneka Wateya Sehekî ya Osgood

Mêr:

1. rind: ___: ___: ___:___:___:___:___: nerind

2. bihêz: ___: ___: ___:___:___:___: qels
3. aktîv: ___: ___: ___:___:___:___: pasîv
4. baş: ___: ___: ___:___:___:___: nebaş
5. çalak: ___: ___: ___:___:___:___: req
6. bilez: ___: ___: ___:___:___:___: hêdî
7. bêkêr: ___: ___: ___:___:___:___: bikêr
8. serkeftî: ___: ___: ___:___:___:___: neserkeftî
9. bikelecan: ___: ___: ___:___:___:___: xwînsar

Di pîvanekê de ji cotên sifetan maddeyên 1, 4 û 7 ji rehendên nirxandinê ne; maddeyên 2, 5 û 8 ji rehendên hêzê ne; maddeyên 3, 6 û 9 jî ji rehendên çalakiyan in (Tavşancıl, 2018: 170).

1.9.4. Pîvaneka Thurstone

Yekemîn kesê ku îddia kiriye helwestên civakî dikarin bêne pîvandin Thurstone e. Wî, ji bo helwestên yek rehend pêş bixe hin teknîkên cuda dîtine. Di nav van de yê herî berbelav, teknîka ‘berawirdkirina cotane’ û teknîka ‘pîvaneka neqebên wekî yekser’ in. Ev teknîk, li gorî çêkirina maddeyan ji hev cuda dibin. Xebata dorvegir a Thurstone ya têkilî raveyên pîvanekan ên ji bo fêmkirin û pîvandina guherbarên sosyolojîk, psîkolojîk û perwerdeyî, bûye bingehe pîvandîne (Andrich, 1988: 303 vghz. Tavşancıl, 2018: 122).

Pîvanekeke Thurstone a ‘neqebên wekî yekser’ bi halê xwe yê resen ji bîst û du risteyên helwestê yê bi serê xwe pêk tê. Her risteyek xwedî nîrxekî pîvanekê yê jimarî ye ku ev nîrx piştî nêrîna pozîsyona nîvtev a wê risteyê ya li ser rehendeke kit û berdewam tê diyarkirin. Helwesta kesan a têkilî meseleya mijara behsê jî, ji wan, tê xwestin ku risteyên ku ew tevlê dibin binîşin, û bi vî awayî helwesta wan tê pîvandin. Pûanê her yekî, nîrxê pîvanekê yê nîvtev ê maddeyên nîşankirî ne (Hogg û Vaughan, 2014: 192-193).

Tablo 1.4: Nimûneya Pîvaneka Thurstone

<u>Herî erênî</u>			<u>Nêtar</u>					<u>Herî nerênî</u>		
1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11

1.9.5. Pîvaneka Likert

Pîvaneka helwestê ya Likert yek ji formên pirsê yê herî bikarbar e. Ev pîvanek di sala 1932an de ji aliyê Rensis Likert ve hatiye pêşxistin. Ev pîvanek rêze-risteyên ku helwesta kesekî ya têkilî objeyekê nîşan didin dihewîne. Di van pîvanekan de du cure riste tê dîtin. Tîpa yekem, risteyên tesdîqê ne yê ku helwesteke êrênî raber objeya têkil nîşan didin. “Ez ji dersa lêkolînê hez dikim.” Risteyeke erênî ye. Tîpa duwem, risteyên tesdîqê ne yê ku helwesteke nerênî raber objeya têkil nîşan didin. “Kêfa min nayê ez lêkolînê bikim.” Nimûneya risteya nerênî ye. Di pîvaneka Likert de risteyên erênî û nerênî hema bi qasî hev tene sazkin. Risteyeke sê, pênc an jî heft vebjêrkî ji kesekî re tê pêşkeşkirin û tê pirsîn ka ew tev dibe yan nabe (Köklü, 1995: 89).

Di pîvaneka Likert de (bo nimûne, ya pênc vebjêrk de) ji beşdarên rêzek pirs tîpîr kirin û ew jî pîvanekeke pênc pûanî bi kar tînin (ev pûan pîranî wekî; ‘teqez wisa ye’, ‘wisa ye’, ‘bêqîrar im’, ‘ne wisa ye’, ‘qet ne wisa ye’ tîpîr kirin) û bi vî awayî nîşan dikin ka ew çi

dereceyî tevî her yek hevokî dibin. Dema ev hevokên helwestê gelekî bi kar hatin, pûanê kesî ji hevokeke serî heta hevoka seriyê din tê berhevkerin û yekûna bi dest ketiye wekî diyarkerê helwesta kesî tê bi kar anîn. Likert di nav nirxên pîvanekê de neqebên yekser/wekhev pêş nedîtibû. Bo nimûne; ferqa navbera ‘wisa ye’ û ‘teqez wisa ye’ mumkîn e ku ji ferqa navbera ‘wisa ye’ û ‘bêqirar im’ mezintir be. Ev tê vê maneyê: pîvanekeke Likert, li ser rehendeke take û berdewam, dikare li ser serastkirina helwesta însanan agahiyan bide, lê dûr e ew nîşan bide ka helwestên cuda çiqas nêzik an dûrî hev in (Hogg û Vaughan, 2014: 194). Li jêr nimûneyeke pênc-vebjêrkî ya pîvaneka Likertî Hogg û Vaughan (2014: 195) wisa nîşan kirine:

Tablo 1.5: Nimûneyeke Pîvaneka Likert

Derbarê îfadeyên li jêr de fikra we çi ye? Bersiva we eger fikra we ya rasteqîn îfade bike ew rast e. Ev ne azmûnek e.					
Madde	Teqez wisa ye	Wisa ye	Bêqirar im	Ne wisa ye	Qet ne wisa ye
Cotkarî karekî xweş e.	—	—	—	—	—
Bêna merî bi cotkariyê teng dibe.	—	—	—	—	—
Ne karê aqilan e însan jiyana xwe bi cotkariyê xerc ke.	—	—	—	—	—
Jiyana cotkariyê bala min dikişîne.	—	—	—	—	—
Xebata li çewlikekê xebateke zexm dixwaze,	—	—	—	—	—

Di pîvanekên Likert de vebjêrkên duwane, sêwane, çarane, şeşane û heftane bi kar tên lê pîvaneka pêncane ya herî pratîk û berbelav e. Ji bo kesên temenbiçûk pîvanekên sêyî heta duyî guncawtir e. Ji bo ku pîvanekeke klasîk a Likert bê çêkirin Anderson (1991 vghz. Kazazoğlu, 2011: 51) heşt pêlikan pêşniyar dike:

- “1) Risteyên erênî yan jî nerênî yê raber objeya helwestê tene nivîsandin.
- 2) Ji bo ku kontrol bikin, ji nifûsa pîvanekê hin nimûne/kes tene bijartin. Ev kes risteyan tedinêrin û wan wekî erênî û nerînî tesnîf ikin.
- 3) Ew risteyên ku kontrolkeran piranî wekî erênî yan nerênî tesnîf nekirine tene derxistin.

4) Riste, li ser kaxizekê bêyî bêne bijartin têne rêzkirin. Telîmat û vebjêrkên bertekan ên guncaw têne lêzêdekirin. Di telîmatê de ji bersivdaran tê xwestin ku ew di derbarê risteyekê de xwe çawa hîs dikin diyar bikin û vebjêrka li wan tê binîşin. Bi vî awayî forma pêşîn tê amadekirin.

5) Forma pêşîn a Likert, li ser nimûneyeke nifûsê tê sepandin. Ji bo ku daneyên watedar û pêbawer bi dest kevin, divê jimara nimûneyan çend caran zêde be ji jimara risteyên pîvanekê.

6) Li encamên sepanê tê nêrîn, korelasyona navbera bertekên her risteyê û pûanên sercem ên pîvanekê tê hesibandin.

7) Bi awayê îstatîstîkî bi pûanê sercem risteyên ku wateyên wan derneketine nayê bikaranîn. Rastiya ku dibê têkiliya her risteyê divê bi pûanê sercem ê pîvanekê re hebe, wekî pîvana nav-hevgir a Likert tê dîtin.

8) Bi risteyên bijartî şiklê dawî yê formê tê amadekirin.”

Encam

Wekî mijareke serekî ya psîkolojiya civakî helwest di jiyana kesan a civakan de kartêker e loma bûye sehayê vekolînê hem di sehayê psîkolojiya civakî hem jî di xebatên navdîsîplînî de, di biwarên wekî sosyoloji, psîkolojî û perwerdehiyê û hin zanistên din de yê li ser helwesta însanan dikarin kar bikin.

Di vê xebatê de bi awayekî kurt psîkolojiya civakî, helwest, têgeh û teoriyên têkilî helwestê, hêmanên helwestê, guherîn, pîvandin û pîvanekên helwestê bi awayekî giştî hatine pêşkeşkirin. Ji bo ku di lîteratura kurdî de li sehayê Bakur xebatên têkilî helwestê û pîvandina wan hema bêje tune yan jî nû çêdibe, ev xebat pêk hat bi mebesta ku bala lêkolîneran bikşîne ser mijara helwestê û biwara psîkolojiya civakî.

Bi vê xebatê hevî heye ku di akademyê de û di sektora taybet de lêkolîner ji bo fêrbûn û pîvandina helwesta kesan di seha û saziyên wekî yê perwerdehî, tendurustî û sektora kar de xebatên xwe bi kurdî bikin da ku lîteratur û zanista kurdî geş bibe û pêşiya lêkolînên nû veke.

Jêder

Açar, Z. (2019). *Tesîra Helwestê li ser Tercîha Ziman di Jiyana Kurdîzanan de -Nimûneya Wanê*. Teza Doktorayê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Bîngol.

Apa Dictionary, pêwendî: 20.01.2019, <https://dictionary.apa.org/motive>

Bohner, G. & Dickel N. (2011). Attitudes and Attitude Changes. *Annual Review of Psychology*. iss. 62, p. 391-417, Department of Psychology, University of Bielefeld.

Hogg, Michael A. & Vaughan, Graham M. (2010). *Essential of Soccial Psychology*. Pearson Education Limited, England.

Hogg, Michael A. & Vaughan, Graham M. (2014). *Sosyal Psikoloji*, 7. basım, çev: İbrahim Yıldız – Aydın Gelmez. Ankara: Ütopya Yayınları.

Kayaoğlu, A. (2011). *Sosyal Psikoloji-I* (ed. Sezen Ünlü), Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

- Kazazoğlu, S. (2011). *Anadili ve Yabancı Dil Derslerine Yönelik Tutumun Akademik Başarıya Etkisi*. Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara.
- Kuppuswamy, B. (1961). *An Introduction to Social Psychology*. Asia Publishing House, printed in India.
- Köklü, N. (1995). Tutumların Ölçülmesi ve Likert Tipi Ölçeklerde Kullanılan Alternatif Seçenekler. *Eğitim Bilimleri Fakültesi Dergisi*, 28(2), 81-93.
- Marshall, G. (2005). *Sosyoloji Sözlüğü*. çev: Osman Akınhay & Derya Kömürcü, Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Millon, T. & Lerner Melvin J. (2003). Personality and Social Psychology-volume 5 *Handbook of Social Psychology*. (ed. Irving B. Weiner), John Wiley & Sons, Inc., Canada.
- Mostyn, Barbara J. (1978). *The Attitude Behaviour Relationship*. Report no. 15, Marketing Communications Research Centre.
- Niilm University (weşana dersê), pêwendî: 10.01.2019, http://niilmuniversity.in/coursepack/humanities/Social_Psychology.pdf
- Social–Psychology, pêwendî: 15.01.2019, [https://personal.us.es/einfante/uploads/Social - psychology-reading. pdf](https://personal.us.es/einfante/uploads/Social_psychology-reading.pdf) -
- Stangor, C. (2011). *Principles of Social Pshichology*. The Saylor Foundation (original source), The Open University of Hong Kong.
- Tavşancıl, E. (2018). *Tutumların Ölçülmesi ve SPSS ile Veri Analizi*. 6. Basım, Ankara: Nobel Yayınları.

DI KILAMÊN DENG BÊJAN DE RENGVEDANA AFATÊN SIRUŞTÎ Û NEXWEŞIYAN

(DOĞAL AFETLER VE HASTALIKLARIN DENG BÊJLERİN KILAMLARINA YANSIMASI)
(REFLECTIONS OF NATURAL DISASTERS AND DISEASES ON 'DENG BÊJ KILAMS')

Murat ÇELİK*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî

Received // Hatîn: 05.03.2022

Accepted // Pejirandin: 03.04.2022

Published // Weşandin: 30.04.2022

Pages // Rûpel: 93-104

DOI: 10.55106/kurdiname.1083159

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0). <http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Çelik, Murat (2022). Di Kilamên Dengbêjan de Rengvedana Afatên Siruştî û Nexweşiyên, *Kurdiname*, no. 6, p.93-104

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Bîra çandî ya kurdan piranî xwe dispêre wêjeya devkî û bêguman cureyeke girîng ya edebiyata devkî jî kilamên dengbêjan in. Loma bûyerên civakî û siruştî bi kilamên dengbêjan hatine vegotin û bi bal nîfşên nû ve hatine veguhestin. Bi vî awayî kilam bûne navgîneke girîng ya pêkanî û parastina bîra civakî. Ev gotar li ser wê yekê radiweste ku erdhej, xela û nexweşî di kilaman de bi çî awayî bûne mijar, bi kîjan ziman û hestê hatine gotin û dengbêjan çawa qala bûyerên siruştî kirine. Di encamê de derket holê ku kilamên li ser êş, afat û bobelatan tevî cih û dîroka wê bi vegotîneke edebî hatine qalkirin û bi piranî jî zimanekî jinane serdest e.

Peyvên Sereke: Kilam, Dengbêj, Afat, Xela, Erdhej, Nexweşî

Özet

Kürtlerin kültürel hafızası büyük ölçüde sözlü edebiyata dayanmaktadır. Sözlü edebiyatın en önemli türlerinden biri de dengbêjlerin kilamlarıdır. Dolayısıyla toplumsal olayların yanısıra doğal afetler de dengbêjlerin kilamlarına konu olmuş ve yeni nesillere aktarılmıştır. Bu şekilde kilamlar toplumsal hafızayı canlı tutmanın ve korumanın önemli bir aracı haline gelmiştir. Bu yazıda deprem, kıtlık ve hastalık gibi konuların kilamlarda hangi duygularla, nasıl ele alındığı ve dengbêjlerin olayları aktarma şekli üzerinde duruldu. Netice olarak kilamlarda doğal afetler ve hastalıklar aktarılırken edebi bir dilin kullanıldığı, zaman ve mekâna dair bilgilerin verildiği tespit edildi. Bununla birlikte genellikle kadınlara özgü bir anlatım biçiminin hâkim olduğu ortaya çıktı.

Anahtar Kelimeler: Kilam, Dengbêj, Afet, Kıtlık, Deprem, Hastalık

Abstract

The cultural memory of the Kurds is largely based on oral literature. One of the most important genres of oral literature is the kilams of dengbêjs. Therefore, in addition to social events; natural disasters have also been the subject of dengbêj kilams and handed down to the next generations. In this way, kilams have become an important tool for keeping and protecting collective memory. This article focused on how and with what feelings the subjects such as earthquake, famine, and disease were issued in kilams and the way dengbêjs featured the events. As a result, it was determined that a literary language was used as well as information about time and place was given while conveying natural disasters and diseases in kilams. Meanwhile, it was also seen that a female-specific expression was dominant.

Keywords: Kilam, Dengbêj, Disaster, Famine, Earthquake, Disease

*Xwendekarê doktorayê li Zanîngeha Dicleyê, muradcelali@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0001-6840-3576>

1. Destpêk

Zanista folklorê, li gor rêbazên xwe li ser çanda madî û menewî ya gelêrî lêkolînê dike, çavkaniyan berhev dike, li gor mijarê wan dabeş û şîrove dike û dinirxîne. Peyva folklorê peyveke hevedudanî ye. Ango ji du bêjeyan pêk tê ku folk di wateya gel de û lore jî di wateya zanist an jî lêkolînê de ye (Gennep, 2011: 151). Bi kurdî tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî “zargotin/zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanistiya şarî” tê gotin. Bi osmanî jî wekî “xalqiyat” û “hikmetî awam” dihat binavkirin. Ev têgeh, di nivê duduyan ê sedsala 19an pê ve wekî têgeheke navneteweyî kete nav gelek zimanan. Bi almanî “die folklore”, bi fransî “le folklore”, bi îtalî “il folklore”, bi îspanyolî “el folklore” û hwd e.

Ev têgeh di serî de tenê ji bo navê materyalan dihat bikaranîn, piştê jî bo navê vê disîplînê jî hate bikaranîn (Yıldırım, Pertev û yê din, 2013: 11). Bi kurtasî folklor ji zayinê heta mirinê, hemû hêmanên çanda madî-menewî yên di jiyana mirovan de, bi awayekî zanistî berhev dike, li ser wan lêkolînan dike, wan dinirxîne, şîrove dike û bi vî rengî pêşketina çanda gel nîşan dide û cudahî û hevbeşiyên di navbera vê çandê û yê din de dibîne (Artun, 2010: 16).

Di vê nivîsê de li ber ronahiya çend mînakên wê behsa kilamên li ser afatên siruştî hatine gotin bê kirin. Lê beriya mînakên wê bi kurtî serencama wêjeya devkî ya kurdî bê dayîn ku kilam jî ji wê hêmanek e.

2. Kurtenêrînek li wêjeya devkî ya kurdî

Ji ber rewşa civakî, siyasî û erdnîgarî gelê kurd hêmanên çanda xwe piranî bi rêya wêjeya devkî parastine û gihandine ber destê nişên nû. Ango kurdan berhemên folklorîk yê çanda xwe bi devkî, vegotinê neqil kirine û pêşve birine. Dema qala berhemên folklorîk tê kirin mebest ji wêjeya gelêrî çîrok, destan, kilam, metelok û yê din in. Heya sedsala 19an hema bibêje wêjeya devkî ya kurdan qet derfet nedîtibû li ser kaxizê bê nivîsîn û bi wî awayî were belavkirin. Helbet beriya vê wêjeya klasîk ya kurdan bi rêya medreseyê dihat nivîsîn, xwendin û bi rêya nivîsê li Kurdistanê dihat belavkirin. Heta hin berhemên klasîk wekî jêderk wêjeya devkî ji xwe re niqandibûn. Bo mînak Ehmedê Xanî (1650-1707) mesnewiya xwe *Mem û Zîn* li ser destana Memê Alan ava kiribû. Lêbelê bi vê berhema Ehmedê Xanî teşe û taybetiyên wê guherîbûn û ji qada wêjeya devkî derbasî ya klasîk bibû. Her wiha Feqiyê Teyran (1590-1660) di helbestên xwe de ji wêjeya devkî sûd wergirtibû û loma li gor berhemên din yê klasîk hê bêtir zelal û bi zimanê gel hatine hûnandin.

Li gor tesnîfa Walter B. Ong çandên devkî du beş in. Çanda devkî ya pêşîn tu tşkiliya wê bi nivîs û çapxaneyê tune, gelên xwediyê wê, çanda xwe bi rêya axaftinê vediguhezînin. Çanda devkî ya duduyan jî bi pêşketina teknolojiyê wekî amûrên ragihandinê radyo, tîlefona, tîlevîzyon û hwd. tê veguhestin. Ji bo vê jî pêşiyê tiştê ku wê bê ragihandin, tê nivîsîn û peyra bi devkî tê gotin (Çifçi, 2017: 23). Li gor vê tesnîfê, çanda kurdan ya devkî heyra sedsala 19an bi rêbaza çanda devkî ya pêşîn anga bêtir nivîsê hatiye neqilkirin. Loma heyra wê heyamê dikevîne navbera çandên ku amûrê wan ê ragihandinê tenê dev e. Piştî ku rojhilatnas bi ziman, bawerî û çanda gelê kurd re eleqedar bûn êdî bi destê wan hêmanên çanda kurdî derbasî ser kaxizê bûn. Bi qasî tê zanîn berhevkariya di warê folklara kurdî de herî pêşîn Auguste Jabayê (1801-1894) polonyayî di navbera salên 1848-1866an de li Erziromê balyoziya Rûsyayê kiriye. Di wê heyamê de Jaba li ser ziman û wêjeya kurdî xebitiye. Akademiya Zanistê ya Rûsyayê û

Mûzeyâ Asyayê ji bo xebatên Jaba piştigiriya wî kirine. Her wiha rojhilatnas Albrecht Bernhard Dorn (1805-1881) bi pêşniyazên xwe rê li ber Jaba xistiye da ku li ser folklor, ziman û edebiyata kurdî û her wiha etnografya û dîroka kurdan bixebite. Jaba li Erziromê di sala 1854an de bi Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) re bûye heval û ji wî kurmançî hîn bûye. Piraniya xebatên xwe yê li ser zimanê kurdî û kurdan bi xêra wî û bi hev re pêk anîne. Ji xebatên Jaba ya herî girîng “*Receuil de Notices et Extraits Kurdes*” e ku xebateke li ser metnên kurdî ye. Jaba li ser ferhengan jî xebitiye, ferhenga *Kurdî-Fransî* û ferhenga *Fransî-Rûsî-Kurdî* amade kiriye. Margarîta Borîssowna Rudenkoyê (1926-1976) di sala 1957an de xebata xwe ya bi navê *Koleksiyona A. Jaba-Destnivîsên Kurdî* daye çapê. Ev xebat ji bo rojhilatnasî û kurdolojiyê çavkaniyeke sereke ye (Celalî, 2016: 49).

Bazîdî dema tevî Jaba dest bi xebatê dike, merivekî rispî û zana ye û li gelek deverên Kurdistanê, Îranê û bajarên Osmanî geriyaye. Loma haj bi wêjeya kurdî ya klasîk û devkî heye û gava karê berhevkarîyê dike, gelek çîrok, gotinên pêşyan, şîret û pendên bav û kalan kom dike (Mokri, 1970: 65, 95, vgz. Pîrbal, 2000: 7). Mela Mehmûd hinek berîte, lawij û kilamên ku di nav kurmançan de li şîn û şahiyên de gelekî tînin gotin jî berhev kirine. Bo mînak *Der Mecalis, Kilamê Keçan, Gewrê û Xelîl Beg, Stranêd Kurmançî, Zenbîlfiroş, Qewlê Hespê Reş* (Marûf, 1973: 8, 10, vgz. Pîrbal, 2000: 7) ji wan yê sereke ne. Ji van berhevkerinên li ser stranên yeka herî girîng jî kilama keça kurd Gewrêya Êzdî ye. Ev kilam behsa evîna Gewrê û Xelîl Begê kurê Ebdî Paşayê ku di sedsala XVIIIan de ji pêşdehatiyên Eleşgirê ye, dike. Ji ber van xebatan Bazîdî wekî kesê kurd yê ku ewil berhevkarîya folklorê kurdî kiriye tê pejirandin (Binetari, 2015: 29, 32).

Bi rastî her çendî meriv bi vî awayî destpêka berhevkarîya folklorê kurdî heya 1850yî bibe jî ev nebûye kevneşopî û ji xwe re di nav civakê de cih negirtiye. Heya ku di sala 1912an de li ser plakên kevirîn deng hatin qeydkirin (Gazeteduvar, 2017). Piştî bandên teyîban tene dagirtin, radyoyên kurdî weşanê dikin rewşa li ser çanda devkî ya kurdî bi vî awayî dewam dike. Di serê sedsala 20an de êdî qeydên kurdî hatine tomarkirin, piştî weşana radyoyaya Rewanê, Bexdayê, Tehran û Urimiyeyê pêvajoyeke nû dest pê kiriye (Akyol, 2007: I/28) û kilam, stran û destanên dengbêjan gotine hatine tomarkirin.

3. Wekî çavkanî, saziya parastin û ragihandinê dengbêjî û kilamên dengbêjan

Dema qala çanda devkî ya kurdî tê kirin beriya çîrok, qewlik, lawij û qesîdeyan kilam (Kardaş, 2013: 148) û stran (Çelik, 2016: 641, 642) tînin bîra mirovan. Jixwe wekî li jor jî behsa wê hatibû kirin jêdera bîra civakî ya kurdan xwe dispêre wêjeya devkî û ji wêjeya devkî jî kilamên dengbêjan diyarker in. Di nav civaka kurdan ya ku ji ber rewşa erdnîgarî, siyasî û aborî ji hevdu dûr ketiye, saziya ku di navbera wan de têkilî daniye, ew li ser nîrxekî berhev kirine, dengbêj û kilamên wan in. Dengbêjên ku ji ber teşeyê jiyana xwe û rewşa xwe ya aborî li gelek deverên Kurdistanê geriyane, li ber destê dengbêj, qewlikbêj û şairan perwerde bûne, di vê heyama perwerde û gerên xwe de ji wê bîra dengbêj û çîrokbêjan sûd wergirtine. Di vê pêvajoya “perwerdehiya” xwe de him ji hêla kemilandina paşxaneyê xwe ya ilmî -meseleya ku li ser kilamê gotin, bûyerên dîrokî û nû yê wekî şer, mîrkuştin, erdhej, xela û hwd. - him jî ji hêla şewaz û awayê bikaranîna deng de xwe pêşva birine. Bi saya van gerên wan û kilamên wan him di nav civakê de bîreke hevpar çêbûye, him rojeveke zindî pêk hatiye û him jî peywira çapemeniyê îcra kirine. Lewra dengbêj gava ji herêmekê çûye herêmeke din agahiya bûyer û

qewimînên wê derê jî bi xwe re biriye (Kardaş, 2012: 202). Li gel vê çand, erf û edet û ziman jî bi xwe re biriye. Dengbêjan dema di şevbihêrkan de, li cem axa û began, di civata giregir û maqûlan de ji wan re pêşiyê qala çîroka kilamên xwe kiriye û peyra jî dest avêtiye kerika guhê xwe û ji wan re kilam gotine. Bi vî awayî çend peywir bi hev re îcra kirine:

1. Bi vî karê kilamgotinê di nav civakê de bûye wesîle ku şênîyên gund li hev bicivin.
2. Bi saya kilaman şahiyek li dar ketiye û dem xweş derbas kirine.
3. Dengbêjan dema qala çîroka xwe kirine, guhdar him ji bûyerên dîrokî û him jî ji qewimînên nû yên li herêmên din agahdar bûne.
4. Dengbêjan, bi kilamên xwe, bîreweriyeke dîrokî û civakî pêk aniye.
5. Bi zimanê edebî yê ku bi hunerên edebî xemilandî ye tevkarî li zimanê gel kiriye û asta axaftinê xurt kiriye.

- Home Office, (2009). UK Border Agency, "Kurdistan Regional Government Area of Iraq," Country of Origin Information Report, UK Border Agency.
- Jiyad, Sajad. Küçükkeleş, Müjge. and Schillings, Tobias, (2020) "Economic Drivers Of Youth Political Discontent In Iraq: The Voice of Young People in Kurdistan, Baghdad, Basra and Thi-Qar," Economic Development Report, Global Partners Governance, p. 45. Available at: <https://gpgovernance.net/wp-content/uploads/2021/02/Economic-Drivers-of-Youth-Political-Discontent-in-Iraq-The-Voice-of-Young-People-in-Kurdistan-Baghdad-Basra-and-Thi-Qar.pdf>
- Kara Kurdistani, "the Kurdistan Islamic Movement," Zanyari.com, July 11, 2021, available at: <https://zaniary.com/blog/5d50ad172aecd/%D8%A8%D8%B2%D9%88%D8%AA%D9%86%DB%95%D9%88%DB%95%DB%8C-%D8%A6%DB%8C%D8%B3%D9%84%D8%A7%D9%85%DB%8C-%DA%A9%D9%88%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86>
- Khadduri, M., & Ghareeb, E. (2001). War in the Gulf, 1990-91: the Iraq-Kuwait conflict and its implications. Oxford University Press.
- Kirişci, K., & Winrow, G. M. (1997). The Kurdish Question and Turkey: An Example of a Trans-state Ethnic Conflict. Psychology Press.
- Kurda, K. (2015). Bad blood between brothers: The KDP, PUK, PKK conflict. Karam Kurda. Kurdish Islamist Movement, (2003) BBC, available at: http://news.bbc.co.uk/2/hi/not_in_website/syndication/monitoring/media_reports/2588623.stm
- Kurdistan Parliament - Department of Information Technology, KRG
- Kurdistan parliament, political party law/17,1993, available at: <https://www.parliament.krd/english/parliament-activities/legislation/1993/>
- Kurdistan-review- Invest in Group, 2013-2014,
- Leezenberg, M. (2000). Humanitarian Aid in Iraqi Kurdistan. CEMOTI, Cahiers d'Études sur la Méditerranée Orientale et le monde Turco-Iranien, 29(1), 31-49.
- MacQueen, B. (2015). Democratization, elections and the 'de facto state dilemma': Iraq's Kurdistan Regional Government. Cooperation and Conflict, 50(4), 423-439.
- Malanczuk, P. (1991). The Kurdish crisis and allied intervention in the aftermath of the Second Gulf War. Eur. J. Int'l L., 2, 114.
- Mansour, R. (2014). Rethinking recognition: the case of Iraqi Kurdistan. Cambridge International Law Journal, 3(4), 1182-1194.
- McDowall, D. (2004). A modern history of the Kurds.. No. s 504, Third-Edition. London: IB Tauris.

- Mee Staff, (2015) "Two Leading Iraqi Kurdish Parties Are Taken Off US Terrorism List, " Middle East Eye, 13 February, Available At: <https://www.middleeasteye.net/news/two-leading-iraqi-kurdish-parties-are-taken-us-terrorism-list>.
- Nader, A., Hanauer, L., Allen, B., & Scotten, A. G. (2016). Regional implications of an independent Kurdistan. Rand Corp Arlington Va Arlington United States.
- Naji, Ali.(2018) "Election of Kurdistan Parliament: Kurdish Competition with Consequences on Baghdad," Al-Bayan Center for Planning and Studies.
- Olson, R. (1992). The Kurdish question in the aftermath of the Gulf War: geopolitical and geostrategic changes in the Middle East. *Third World Quarterly*, 13(3), 475-499.
- Prados, A. B., & Library of Congress. Congressional Research Service. (1994, May). The Kurds in Iraq: Status, Protection, and Prospects. Congressional Research Service, Library of Congress.
- Reilly, B., Norlund, P., & Newman, E. (2008). Political parties in conflict-prone societies: Regulation, engineering and democratic development (Vol. 2, pp. 1-7). New York: United Nations University Press. p. 3.
- Rogg, I., & Rimscha, H. (2007). The Kurds as parties to and victims of conflicts in Iraq. *International Review of the Red Cross*, 89(868), 823-842.
- Sari, İ. (2019). The United States Foreign Policy Towards Kurds. *Middle Eastern Studies/Ortadogu Etütleri*, 11(2).
- See the "KDP: Kurdistan Democratic Party, (2021). available at: <https://thekurdishproject.org/history-and-culture/kurdish-democracy/kdp-kurdistan-democratic-party/>
- See the "KDP: Kurdistan Democratic Party," available at: <https://thekurdishproject.org/history-and-culture/kurdish-democracy/kdp-kurdistan-democratic-party/>
- See the "Kurdistan Democratic Party," website, available at: <https://www.kdp.se/?do=what>
- See The Official Website of The Patriotic Union of Kurdistan, (2021) available At: <https://www.puknow.com/english/about?section=62>
- See the UNSC Resolution No. 688 on April 5, 1991. Available at: <https://undocs.org/pdf?symbol=en/S/PV.2982>
- See the Website of "Congresses of Kurdistan Democratic Party (1946-1999)," Available at: <https://www.kdp.se/?do=congress>
- Shallcross J. Nicholas,(2015) Major, USA Kurdistan Regional Government Assessment, Working Paper.
- Stansfield, G. (2017). The evolution of the political system of the Kurdistan region of Iraq. In *Between State and Non-State* (pp. 61-76). Palgrave Macmillan, New York.
- Stansfield, G. R. (2003). *Iraqi Kurdistan: Political development and emergent democracy*. London: Routledge..
- Taha, M. Y., & Movileanu, A. (2020). Kurdistan Parliament: Emergence And Development Of A Non-State Parliamentary System. *PalArch's Journal of Archaeology of Egypt/Egyptology*, 17(6), 1113-1132.
- The Kurdistan Islamic Movement reelected Irfan Abdulaziz without self-nomination as a candidate, *Roj News*, February 5, 2022, available at:

<https://rojnews.news/%D9%83%D9%88%D8%B1%D8%AF%D8%B3%D8%AA%D8%A7%D9%86/%D8%A8%D8%B2%D9%88%D8%AA%D9%86%DB%95%D9%88%DB%95%DB%8C-%D8%A6%DB%8C%D8%B3%D9%84%D8%A7%D9%85%DB%8C-%D8%A8%DB%95%D8%A8%DB%8E-%D8%AE%DB%86-%DA%A9%D8%A7%D9%86%D8%AF%DB%8C%D8%AF%DA%A9%D8%B1%D8%AF%D9%86/>

Today is the anniversary day of the establishment of the Kurdish Regional Government, Rudaw, 04-07-2019, accessed in September 29, 2021, from: <https://www.rudaw.net/sorani/kurdistan/040720191>

Voller, Y. (2014). The Kurdish liberation movement in Iraq: From insurgency to statehood. New York: Routledge.

Waisy, K. S., (2015). The Roots of the Iraqi Kurdish Internal Rivalries, Conflicts and Peace Process 1964-2000. American International Journal of Research in Humanities, Arts and Social Sciences, 10(3), 220-232.

Wrya Hama Karim, "30 years passed since the establishment of the Kurdistan Islamic Movement," NRT Report, NRT.net, May 13, 2017 Available at: <https://www.youtube.com/watch?v=AGTIqMV2EwA>

Yildiz, K., & Tayşi, T. B. (2007). The Kurds in Iraq: The past, present and future (p. 109). London: Pluto Press.

Bafel Talabani and Lahore Genki selected for the co-presidency of PUK, February, 2, 2020, Available at: <https://shafaq.com/en/kurdistan/bafel-talabani-and-lahore-genki-selected-for-the-co-presidency-of-puk/>

Karwan Faidhi Dri, PUK's Bafel Talabani denies pressuring rival co-chair to leave Iraq, Rudaw.Net, September 4, 2021, Available at: <https://www.rudaw.net/english/kurdistan/04092021>

TRANSLATION//WERGER

LI TIRKIYÊ BAVÊ ZAL Û ASTA SERKEFTINÊ*

Norman M. BRADBURN**

(Wergera ji Îngilîzî: Ahmet KAN***)

Article Type: Translation Article // Gotara Wergerî**Received // Hatîn:** 22.04.2022**Accepted // Pejirandin:** 27.04.2022**Published // Weşandin:** 30.04.2022**Pages // Rûpel:** 144-150This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0). <http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>**Citation/Atîf:** M. Bradburn, Norman (2022). Li Tirkiyê Bavê Zal û Asta Serkeftinê, Translated by Ahmet Kan, *Kurdiname*, no. 6, p.144-150**Kurte**

Vê lêkolînê daneyên navçandî pêşkêşî dike da ku piştgirî bide hîpoteza ku serdestiya bav di mêran da bi hewcedariya kêr serkeftinê (n Ach) ra têkildar e. Delîlên vê hîpotezê (a) bi ceribandina komên rêveberên ciwanên Amerîkî û Tirk û (b) bi berhevkirina n jimareyên tirkên ên ku di asta ku bavên wan serdest bûn da ji hev cuda bûn, hatin bidestxistin. Rêvebîrên piçûkên Amerîkî, li gorî Tirkên, bi rêjeyek girîng a serkeftinê (n Ach)ê pir zêde bûn. Di 3 nimûneyên serbixwe da, Tirkên ku ji hêla bavên xwe ve kêmtir serdest bûn, li gorî temenê piçûk dema ku bavên wan miribûn an dema ku ew yekem car ji bavê xwe cuda jiyabûn, ji zilamên ku bêtir ji hêla bavên xwe ve serdestî dîtibûn, serkeftina wan pir zêde bû. Lêbelê, têkiliyek wusa nehat dîtin, dema ku serdestî bi raporên Ss-ê yên ku di jiyana wan de xwedî bandorek herî mezin bû hate pîvandî.

Abstract

This study presents cross-cultural data to support the hypothesis that father dominance is associated with low need Achievement (n Ach) in men. Evidence for the hypothesis was obtained (a) by testing groups of American and Turkish junior executives and (b) by comparing n Ach scores of Turks who differ in the degree to which they were dominated by their fathers. The American junior executives, as compared with the Turks, were found to have significantly higher n Ach scores. In 3 independent samples, Turks who were less dominated by their fathers, as measured by Ss' age when their fathers died or when they first lived apart from their fathers, had significantly higher n Ach scores than did men who were more dominated by their fathers. Such a relationship was not found, however, when dominance was measured by Ss' reports of who had had the greatest influence in their lives.

Lêkolînê ku li ser têkiliya ezmûnên fêrbûna zû bi pêşkeftina hewcedariya serkeftinê ra (n Ach) vekolîn dîkin, bi piranî, daneyên ku ji malbatên bi giranî yên çîna navînên Amerîkî hatine wergirtin bikar anîne. Winterbottom (1958) ji bo pêşvebirina hewcedariyek xurt a serkeftinê girîngiya perwerdehiya destpêkê ya serbixwe û serweriyê nîşan da. Rosen û D'Andrade (1959) dîtin ku hem dê û bavên kurên bi serkeftina hewcedariya wan a zêde asteke bilindtir a hêviyê ji bo kurên xwe hene û ji dê û bavên kurên bi destkeftiyên hewcedariya wan kêr bandorek erênî li ser tevgera têkildar a bi destketinê zêdetir nîşan didin. Di heman demê

* Ev gotar bi Îngilîzî bi van agahîyan hatiye weşandin: *Journal of Abnormal and Social Psychology, N Achievement And Father Dominance In Turkey*, 1963, Vol. 67, No. 5, 464-468. Ev lêkolîn, ji teza doktorayê ya Bradburnî (1960) ye. Lêkolîna vê projeyê ji hêla Weqfa Ford ve hat piştgirîkirin.

** Nivîskar dixwaze spasîya xwe ji David C. McClelland ra bike ji bo alîkarî û teşwîqkirina wî di amadekirina vê gotarê de.

***Xwendekarê doktorayê li Zanîngeha Dicleyê, ahmedkani21@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0002-4968-3581>

da wan, cûdahiyek girîng di navbera tevgera bav û ya dayikan da li ser pîvanek "otorîterîzmê" dît ku tê da jimara rêwerzên taybetî, gazîkirin û asta serdestiya ku li hember kurek tê destnîşan kirin. Zarokên ku bi destkeftiyên hewcedar ên zêde xwedî dayikên otorîter bûn, lê bavên ku meyla xwe li derveyê wêneyê digirtin, dema ku kurên ku bi hewcedariya wan kêr bûn, bavên wan otorîter bûn û meyldar bûn ku destwerdana hewlên kurên xwe yê ji bo bidestxistina serkeftinê bikin.

Van lêkolînan destnîşan dikin ku şewazek taybetî ya têkiliyên malbatî meyl dike ku pêşkeftina hewcedariyek mezina a serketinê pêş bixe. Ji ber ku van lêkolînan li ser malbatên çîna navîn ên Amerîkî bûn, pirs bi xwezayî derdikeve holê ka gelo vedîtînan wan dikarin li ser çarçoveyek çandî ya din werin gelemperî kirin. Delîlên dawî yê ku McClelland (1961) ji hevpeyvînan bi dayikan ra li Brezîlya, Japonya û Almanyayê bi dest xistine, bi giranî vedîtînan Rosen û D'Andrade piştgirî dikin ku li gorî dê û bavên kurên ku bi hewcedariya wan kêr in, dayikên kurên bi destkeftiyên hewcedar ên zêde. Germahiyek mezintir nîşan didin û ji bo kurên xwe hêviyên bilindtir hene, bavên van xortan li ser kurên xwe kêmtir serdestiyê nîşan didin. Lêkolîna ku li vir hatî ragihandin, bandora serdestiya bav li ser pêşkeftina gihîştina hewcedariyê di çandek din da, ango ya Tirkiyê, dike.

Li gorî giraniya kevneşopî ya îslamî ya li ser serdestiya mêr, figurê navendî di malbata tirk da bi eşkere bav e. Hevpeyvînan bi mêrên tirk ra wêneyê bavê xwe wek kesayetek otorîter ku bêyî ku bi endamên din ên malbatê ra bişewire hemû biryarên derbarê malbatê da digirt. Hema hema li seranserê cîhanê, tirkên ku bi wan ra hevpeyvînan hatiye kirin, bavên xwe wek hişk, qedexekar, dûr, serdest û otokratîk binav dikin. Kêr ji wan bi bav û kalên xwe ra û yê ku bi bihaneya bêhnvedaneke vekirî ev yek kiribûn nîqaş kiribûn. Çend zilaman ragihandin ku piştî ku bi bavên xwe ra nîqaş kirin, zêdetirî 10 salan bi wan ra neaxivîn.

Daneyên ji hevpeyvînan her weha destnîşan kirin ku serdestiya bav ji heyama normal a mezinbûnê dirêjtir bû û bi rastî, di tevahiya jiyana bavê da berdewam kir. Zilamek ragihand ku piştî ku ew zewicî bû û malbata xwe hebû jî wî newêribû cixareyê bikişîne, heta bi lingên xweavêtina ser hev li ber bavê xwe rûne an jî bi her awayî dijberiya wî bike. Zilamekî din, dema jê pirsîn gelo tu carî bi bavê xwe ra nakokî çênebûne, got ku wî qet li ser ti mijarekê bi bavê xwe ra negotiye, ji ber ku bavê wî di piçûkiya wî da miriye. Piştî derket holê ku ew 19 salî bûye, dema bavê wî miriye.

Wê gavê pir zelal xuya dike ku li gorî malbata Amerîkî (wek mînak, Miller & Swanson, 1958) bav di malbata tirk da kesayetek pir otorîter û serdesttir e. Li ser bingeha vedîtînan Rosen û D'Andrade (1959), em ê pêşbînî bikin ku mêrên Amerîkî, li gorî mêrên Tirk, dê bi navînî, xwedan astek girîng a pêdiviyê be. Ji bo ceribandina hîpotezek weha bi hişkî pêdivî bi ceribandina nimûneyên nûnerê zilamên Amerîkî û Tirk heye. Digel ku daneyên li ser nimûneyek weha di van demên dawî da li Dewletên Yekbûyî peyda bûne (Veroff, Atkinson, Feld, & Gurin, 1960), nebûna îmkânên lêkolîne yê tîra xwe lêkolînek weha li Tirkiyê ne gengaz kir. Lêbelê, daneyên ku li jêr hatine ragihandin, ji bo hîpotezê, li ser nimûneyên pir bisînorkirî, hin delîlan pêşkêş dikin.

Hîpoteza duyemîn a ku ji aliyê vedîtînan Rosen û D'Andrade ve tê pêşniyarkirin ev e ku li Tirkiyeyê ew kurên ku ji ber hin sedeman ji bandora bavên xwe xilas bûne, ji kurên ku di bin bandora bavên xwe da mane, serkeftitir in. Ji ber vê yekê em li bendê ne ku ew kurên ku çûne dibistanê, bavên wan di ciwaniya xwe da mirine, an ku bi regekî din di temenê biçûk da ji

bavê xwe veqetiyane, dê ji yên ku di malek ku di bin serweriya bavê xwe yê serdest, otoriter da mane, serkeftîtir bin. Bi daneyên ku li jêr hatine pêşkêş kirin, ev hîpotez li ser sê nimûneyên serbixwe hate ceribandin.

RÊBAZ

Bikerên Beşdar

Delîlên têkildarî hîpoteza yekem bi ceribandina komên rêveberên ciwan ên Tirk û Amerîkî yên ku beşdarî qursa rêveberiya navîn a li dibistanek rêveberiya karsaziyê bûne hate bidestxistin. Koma tirk ji 49 rêveberên ciwan ên ji hemû deverên Tirkiyê pêk dihat ku di payizên 1958 û bihara 1959 da beşdarî bernameya rêveberiya navîn a Enstîtuya Rêveberiya Karsaziyê ya Zanîngeha Stenbolê bûn. Koma Amerîkî ji 46 rêveberên ciwan pêk dihat ku di havîna 1957an da beşdarî bernameya rêveberiya navîn a Dibistana Karsaziya Harvardê bûn. Bernameya Stenbolê li gorî ya Harvardê hat çêkirin û bi hevkarîya endamên fakulteya Harvardê hat saz kirin. Li her du dibistanan, xwendekarên di bernameyê da ji hêla kardêrên xwe ve hatine hîlbijartin û şandin, ku hemî lêçûnên wan yên li dibistanê dane. Her du kom di temen û paşxaneyê perwerdehiyê da li hev hatin.

Hîpoteza duyemîn bi sê komên cuda yên mêrên tirk ra hat ceribandin. Di koma yekê da 47 mamosteyên ku li Enstîtuya Gazî ya li Enqereyê ku zanîngeheke bilind a mamostetîyê ye, di bernameya pedagojîyê da dixwendin, bûn. Ev bername ji bo ku mamosteyên xwedî ezmûn karekî pêşkeftîtir bide û ji wan ra gelek pozîsyonan di rêveberiya dibistanê da amade bike hate çêkirin. Koma duyemîn ji 47 xwendekarên mezûn ên di kursa rêveberiya karsaziyê da li Enstîtuya Rêveberiya Karsaziyê ya Zanîngeha Stenbolê pêk dihat. Koma dawî ji 24 rêveberên payebilind ên firmayên taybet ên li herêma Stenbolê pêk dihat.

Pîvana Serkeftinê

Bo hemî bikeran, ji şeş wêneyan guhertoyek Testa Têgihîştina (Apperception) Tematîk a ku ji hêla McClelland (1961) ve ji bo karanîna bi komên pîşeyî ra hatî pêşve xistin, hate dayîn. Pirtûka azmûnê ji şeş wêneyan pêk dihat ku bi kaxizên vala veqetandî, her pelek pirsên standard ên ji bo çîrokên TATê vedihewîne. Wêneyên ku hatine bikar anîn Jimar 5, 28, 83, 9, 24, 53 - bi wê rêzê - wekî ku di Atkinson (1958, Pêvek III) da hatî vegotin. Bikeran 15-20 saniye li her wêneyekî mêze kirin û piştê li ser rûpela jêrîn kurteçîrokek ji bo bersiva pirsan nivîsandin. Ji bo her çîrokek pênc deqe destûr hat dayîn, bi tevahî 30 hûrdem ji bo tevahiya testê. Hemî ceribandin di danîşînên komê da hate kirin, ji bilî ku rêveberên payebilind bi kesane hatine ceribandin. Di her rewşê da îmtîhan ji aliyê nivîskar ve bi alîkariya wergêrekî tirkî hatiye kirin.

Hemû çîrok bi tirkî hatine nivîsandin û piştê ji aliyê wergêrên pisporekî tirk ve hatine wergerandin bo îngilîzî. Çîrok ji bo serkeftinê li gorî prosedûra ku ji hêla McClelland, Atkinson, Clark, û Lowell (1953) ve hatî destnîşan kirin, hatine tomar kirin. Her çîrok ji hêla nivîskarê ku xwedan ezmûnek girîng a dengdanê bû û pêbawerîya wî li ser nimûneyên berê li ser 0,90ê hatî destnîşan kirin, hate xelat kirin.

Ji wergêran ra hat talîmat kirin ku wergeran bi qasî ku pêkan e bi wate bikin û çîrokan neguherînin da ku ji hêla stîlistîkî ve bêtir werin pejirandin. Nimûneyek ji 60 çîrokan ji aliyê du wergêrên cuda ve hatiye wergerandin. Têkiliya rêza rêzê ya di navbera xalên serkeftinê li ser her du wergeran da 0,98 bû.

TABLO 1
CUDAHIYA NÎŞANÊN SERKEFTINÊ DI NAVBERA RÊVEBERÊN CIWAN ÊN AMERİKÎ
Û RÊVEBERÊN CIWAN ÊN TIRK DA

Nimûne	Serekeftin	Têkçûn
Rêveberên ciwan ên Amerîkî	33	13
Rêveberên ciwan ên tirk	11	31

Pîvanên Serdestiya Bavê

Asta serdestiya bavê bi du awayan hate nirxandin. Pêşî, ji beşdarên bi hêsanî hate pirsîn, "Kî di jiyana we da kesê herî bibandor bûye?" Bersiv wekî jimareya bav an bav (mamê an mezin), birayê figurê dê an dayikê (met/apût an xwişka mezin), an kesên ne ji malbatê (mamoste, heval, hwd.) hatine kod kirin. Ji bo pîvana duyemîn, ji beşdarên hat pirsîn ku ew yekem car di kîjan temenî da ji dêûbavên xwe cuda dijîn, li ser wê texmînê ku kurek zûtirîn ji bavê xwe dûtir dijîn dê şansê bav kêmtir be ku li ser wê serdestiyê bike. Her weha agahdarî hate bidestxistin ka dêûbavên zarokan ji hev veqetiyane û ew bi diya xwe ra jiyaye, û gelo bavê wan sax e û heke na, dîroka mirina wê heye an na.

Encamên derketî

Hîpotez 1

Li ser bingehê cudahiya rola giştî ya bav di malbatên tirk û amerîkî da, me pêşbînî kir ku rêvebirên karsaziya Amerîkî, bi navînî, ji hevtayên xwe yê tirk zêdetir serkeftî bin. Wekî ku di tabloya 1ê da tê xuyang kirin, rêjeya navînî ya serkeftina rêveberên ciwan ên Amerîkî yê ku beşdarî bernameya rêveberiya navîn li Dibistana Karsaziyê ya Harvardê dibin 11 bû li gorî serkeftina navîn a 6,5 ji bo rêveberên piçûk ên ku beşdarî bernameyek bi heman rengî li Zanîngeha Stenbolê dibin. Cûdahiya di navbera van her du navînan da ji hêla îstatîstîkî ve girîng e ($x^2 = 16.44$, $p < .001$) û bi hêz pêşbîniya me piştgirî dike. Lêbelê ji ber kêmasiyên nimûneyên me, ne mimkûn e ku em van dîtînan li derveyî komên me yê heya giştî bikin, û divê em tîr bidin zanîn ku ev dane bi hîpoteza cudahiya navînî ya di navbera mîrên Tirk û Amerîkî de ne.

Hîpotez 2

Tevî ku bavê Tirk bi giştî ji bavê Amerîkî kesayetek pir otorîtertir e jî, dixuye ku dê di nav malbatên Tirk da di asta otorîterîzma bavê da cûdahiyek berbiçav hebe. Ji ber vê yekê me hîpotez kir ku di nav komên tirkan da ew kurên ku ji hêla bavên xwe ve kêmtir serdest bûn, dê bi gelemperî serkeftîtir ji yê ku bêtir ji hêla bavên xwe ve tene serdest kirin hebe.

Tablo 2 berawirdkirina pûanên serkeftinê ji bo Tirkên serdest ên bilind û nizm ên Tirk di nimûneya rêveberên ciwan da pêşkêş dike, li gorî bersivên li ser pirsê, "Di jiyana we da kesê herî bibandor kî bûye?" Serkeftina komên bilind û nizm bi berhevkirina hemî pûanên serkeftinê ji bo nimûneyên tirkî û şikandina navgîniya hevpar a 6.5 hatin bidestxistin. Wekî ku di Tablo 2 da tê dîtin, pêşbîniya me pêk nehat, her çend meylek sivik hebû ku zilamên bi serkeftina bilind

diya xwe an figurên din (bi taybetî mamoste) wekî herî bi bandor di jiyana xwe da binav bikin. Lêbelê ev meyl ji hêla îstatîstîkî ve ne girîng bû ($X^2 = .78$, $df = 2$).

Awayê duyemîn ji bo ceribandina hîpotezê ev e ku meriv serkeftîr pûanên wan zilamên ku di temenek piçûk da ji bavên xwe veqetiyane were hesibandin. Xwendekarên Enstîtuya Gaziyê "ceribandineke xwezayî" ya hema hema bêkêmasî temsîl dikin, ji ber ku bi qasî nivê wan ji 14 saliya xwe ve ji dê û bavê xwe cuda dijîn, piraniya wan di Enstîtuyên Gundan da ne. Enstîtuyên Gundan ji aliyê dewleta Tirk ve wek dibistanên mamostetiyê hatin avakirin ku derçûyên wan derçûn û li gundan ders bidin.

TABLO 2

TÊKILIYA SERKEFTINÊ BI BERSIVÊN PIRSA "KESÊ HERÎ BANDORÎ" RA

Bav an Rengê bav	26	29
Dê an Rengê dê	11	9
Kesên din, wek nimûne, mamoste, heval û hwd.	18	14

Zarok di 14 saliya xwe da dikevin enstîtuyên gund û çend salan li wir dimînin. Ji danasînên Enstîtuya Gundan (Makal, 1954) diyar dibe ku jiyan li wirê ji bandora malbatê ya zordar a ku me pêşbînî kiriye dê pêşveçûna motîvasyona serketinê bifetisîne, azad e. Ji ber vê yekê me pêşbînî kir ku xwendekarên Enstîtuya Gazî yên ku çûne Enstîtuya Gund an jî ji ber sedemek din di 14 saliya xwe da ji dê û bavê xwe cuda jiyane, dê ji yên ku bi dê û bavê xwe ra zêdetir ji temenê xwe yê piştê 14 saliya derbas kirine, serkeftîr bin.

Wekî ku di Tabloya 3 da tê dîtin, ev hîpotez hate pejirandin. Bi dabeşkirina serkeftin pûanên xwendekarên perwerdehiyê li ser du koman li ser navîn, em dibînin ku rêjeya zêde ya wan kesên ku di 14 saliya xwe da ew û dê û bavê xwe ji hev dûr dijiyan, ji yên ku piştî 14 saliya xwe bi dê û bavê xwe ra jiyana xwe domandine, zêdetir derdikeve. ($X^2 = 3,59$, $p < .03$, testa yek dûvikê).

Hîpotez dikare bi daneyên koma xwendekarên karsaziyê jî were ceribandin, her çend ne bi heman rengî be ji ber ku hindik ji wan di 14 saliya xwe da ji dêûbavên xwe cuda dijîn. Ji ber ku serdestiya bavê tirk heta mezinbûna kurê wî jî berdewam dike, em dikarin li bendê bin ku di navbera serkeftin û veqetîna ji bavê da tîkiliyek erênî peyda bikin, her çend ev veqetîn heya ku kur 14 saliya xwe nebûbe jî. Ew zilamên ku bavên xwe wenda kirine an jî di 18 saliya xwe da ji wan cuda jiyane, komeke tîra xwe mezin e ku hîpoteza me biceribîne. Dîsa, di tabloya 3yê da, em dibînin ku rêjeyek mezintir ji wan zilamên ku bavên xwe wenda kirine an ku di 18 saliya xwe da ji wan cuda jiyaye, zêdetir serketîne ji yên ku piştî 18 saliya xwe bi dê û bavê xwe ra dijîn ($x^2 = 4,98$, $\xi < .025$, testa yek dûvik).

Di dawiyê da, em dikarin vê hîpotezê bi koma rêveberê payebilind ra kontrol bikin. Di vê rewşê da dîsa zilam li ser esasê ku ji dê û bavê xwe cuda jiyane yan ne di 18 saliya xwe da bavê xwe wenda kirine bûne du kom. Berawirdkirina xalên serkeftinê ji bo her du koman dîsa hîpotez piştrast kir, her çend ne bi qasî du komên berê be jî ($x^2 = 1.69$, $p < .10$, testa yek dûvik).

TABLO 3
TÊKILIYA ZÛ VEQETÎNA JI BAVÊ Û SERKEFTINÊ

Nimûne	Serkeftina zêde	Serkeftina kêma
Berî 14 salî veqetîna ji malê(X)	16	8
Piştî 14 salî mana li malê	8	15
Berî 18 salî veqetîn (Kar û xw)	10	3
Piştî 18 salî man	12	22
Berî 18 salî veqetîn (rêvebir)	6	2
Piştî 18 man (rêvebir)	6	10

Li ser bingeha van sê ceribandînên serbixwe yê hîpoteza me, em ê encamê bidin ku, bi kêmanî bi pîvanek objektîf ve, derxistina laşî ya ji bandora bav ji pêşveçûna serkeftina bilind ra dibe alîkar, her çendî bi dîtina hin beşdarên hîn jî dikarin bavê xwe wekî kesê herî bi bandor di jîyana xwe da bibinin.

NÎQAŞ

Daneyên ku di vê gotarê da hatine ragihandin piştgiriyeke pirçandî dide vedîtîna Rosen û D'Andrade (1959) ku bavên kurên bi serkeftina kêma di otorîterîzm û serdestiyê da ne. Vedîtîna weha destnîşanê dikin ku cûdahiyên çandî yê berbiçav di avakirina tevgera rola dêûbav da dibe ku bandorek xurt li ser pêşveçûna motîvên civakî hebe. Cûdahiyên berferê di asta navînî ya hin motîvên wek serkeftinê wê hingê dibe ku encamên kûr ji bo pêvajoyên civakî yê mezin hebin, mîna ku McClelland (1961) vê dawiyê di derbarê serkeftinê û pêşkeftina aborî da destnîşan kiriye. Lêbelê, divê meriv di derxistina encamên hêsan da li ser bandora zû veqetîna kurik ji bavê xwe li ser pêşkeftina serkeftinê hişyar be. Veroff, Atkinson, Feld, û Gurin (1960) destnîşan kirin ku li Dewletên Yekbûyî mîrên ku ji malbatên ku tê da yek an her du dêûbav mirine an dêûbav hev berdane an jî ji hev cuda bûne tene neserkeftîne; ango kesê bersivdar 16 salî bû ku dida zanîn ku ew ji malên saxlem hatine ji wan ên mal parçebûyî serkeftîtir in. Ravekirina vê nakokiyê eşkere ya di encaman da xuya dike ku di reftarên rola cuda ya bav û kalan da li Tirkiye û Dewletên Yekbûyî ye. Li Dewletên Yekbûyî, ku dibe ku bav rolek teşwîqkartinê bilîze, standardên bilind ji kurik ra di teşwîqkirina wî da bi dest bixe, ji destdana bav tê wateya rakirina modelek mîrî ya erênî ji bo serketinê. Li aliyê din, li Tirkiyeyê, ku bav figurek pir serdest e, windakirina bavê xwe revînek ji bandorên rawestandî yê ku bi serkeftinê ve girêdayî ne, nîşanê dide û kur di hêla ku bersivê bide her hêzên erênî yê ku wî ji bo tevgera tîkildar bi destkeftiyên xelat bike. Ji ber vê yekê heman koma rewşên objektîf li gorî çarçoweya çandî dibe ku bibe sedema encamên cuda.

Girîng e ku were destnîşan kirin ku rakirina bandorên bi vî rengî yê astengdar ên wekî serdestiya bav dê bixweber nebe sedema pêşkeftina serkeftinê. Di heman demê da divê hin hêzên erênî yê wekî danîna standardên bilind ên jêhatîbûnê û nîşandana germahiya hestiyarî ji hêla her du dêûbavan ve jî hebin da ku pêşkeftina serkeftinê di kur da were pêşve xistin. Her çend di vê lêkolînê da bal were kişandin ser girîngiya rola bav, lê divê were destnîşan kirin ku ji bo tîgihîştina tam a geşepêdana motîvan bandora cihêreng a tevgera her du dêûbavan li hember zarok girîng e.

Çavkanî

ATKINSON, J. W. (Ed.) *Motives in fantasy, action, and society*. Princeton, N. J.: Van Nostrand, 1958.

BRADBURN, N. M. *The managerial role in Turkey: A psychological study*. Unpublished doctoral dis-sertation, Harvard University, 1960.

McCLELLAND, D. C. *The achieving society*. Princeton, N. J.: Van Nostrand, 1961.

McCLELLAND, D. C., ATKINSON, J. W., Clark, R. A., & LOWELL, E. L. *The achievement motive*. New York: Appleton-Century-Crofts, 1953.

MAKAL, M. *A village in Anatolia*. London: Vallentine Mitchell, 1954.

MILLER, D. R., & SWANSON, G. E. *The changing American parent*. New York: Wiley, 1958.

ROSEN, B. C., & D'ANDRADE, R. The psychosocial origins of achievement motivation. *Sociometry*, 1959, 22, 185-217.

VEROFF, J., ATKINSON, J. W., FELD, S. C., & GURIN, G. The use of thematic apperception to assess motivation in a nationwide interview study. *Psychol. Monogr.*, 1960, 74(12, Whole No. 499).

WINTERBOTTOM, M. R. The relation of need for achievement to learning experiences in independence and mastery. In J. W. Atkinson (Ed.), *Motives in fantasy, action, and secret y*. Princeton, N. J.: Van Nostrand, 1958. Pp. 453—478.

(Received August 8, 1962)

BOOK REVIEW / NIRXANDINA PIRTÛKAN FOLKLORÊ MA RA ÇEND NUMÛNEY

Malmîsanij, Berdan Matbaacilik, Istanbul, 2000, 320 rîpel.

Murat BAŞARAN*

Article Type: Book Review // Nirxandina Pirtûkan

Received // Hatîn: 18.12.2021

Accepted // Pejirandin: 08.01.2022

Published // Weşandin: 30.04.2022

Pages // Rûpel: 151-156

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0). <http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Başaran, Murat(2022). Folklorê Ma Ra Çend Numûney, *Kurdiname*, no. 6, p.151-156

Wexto ke kes behsê zazakî bikero bêguman nameyê Malmîsanijî zî mîyanê nê behsî de ravêreno. Ey sey Kovara *Tîrêj*, *Hêvî*, *Armanc* xeylê kovaran de bi zazakî nuştö. Goreyê xeylê melumatan wextanê modernan de nuştöxê zazakî yo verên Malmîsanij o. Serra 1996î ra heta ewro o û tayên embazê ey ser standardkerdişê zazakî xebitênê. Semedo ke nê xebatanê xo biresnê şarî rê 1997 de Kovara Vateyî awan kenê û Kovara Vateyî hema zî weşanê xo domnena. Malmîsanij tena ziwanî ser o ney, tarîx û edebîyatî ser o zî xeylê xebitîyayo û nê waran de zî xeylê eserê zazakî, kurmanckî û tirkî nuştê.

Nê kitabê xo de zî mintiqayanê cîya cîyayan ê ke tede zazayî ciwênê ra xeylê nimûneyê folklorîkî arêdayê. Kitabî de nê beşî estê:

- Deyîrî (Dêrî)
- Vatey(ê) Verînan
- Mertalî
- Du'ayî
- Estanekî (istanikî)
- Meseley(î) û Fiqrey(î)
- Hîkayey(ê) Heskerdişî
- Qisey(ê) Diletî
- Namey(î)

Nê beşan de her mintiqa ra xeylê nimûneyî estê. Wendox eşkeno her sernameyî de goreyê mintiqayan varyantan ra xeberdar bo û goreyê mintiqayan cigêrayîşan bikero. Ma na xebata xo de semedo ke karê cigêrayoxan asan bo malzemeyanê folklorîkan goreyê mintiqayan abirnenê û bi nê şekilî kitabî zî danê naskerdene. Peynîya xebate de zî ma do kêmasîyanê kitabî ra behs bikerê.

* Wendekarê Dكتورa yê Kurdolojî, Wezaretê Perwerdeyî de Mamosta, muradbasaran@gmail.com, Orcid: 0000-0003-4859-7443

Tablo 1 Hûmara Deyîran Goreyê Mintiqayan

Mintîqa	Hûmare
Aldûş (Gerger)	1
Çêrmûge (Çermik)	10
Gêl (Egil)	7
Licê (Lice)	8
Pali (Palu)	7
Pîran (Dicle)	31
Kome	64

Kategorîzasyonê deyîran sey tabloyê corênî yo. Seke tablo de zî aseno tayê mintiqayan ra qet nimûneyê deyîran çîn ê.

Tablo 2 Hûmara Vateyê Verênan Goreyê Mintiqayan

Mintîqa	Hûmare
Aldûş	-
Çêrmûge	120
Çewlîg	4
Dêrsim	9
Gêl	18
Hênî	7
Licê	2
Maden	2
Motkî/Modan	1
Pali	1
Pîran	390
Sêwregi	34
Kome	588

Taybetîya ke ma seba deyîran behs kerdbî qandê vateyê verênan zî ravêrdî ya. Seke tablo de zî aseno hetê vateyê verênan ra tayê mintiqayan ra nimûneyî zaf tay deyyê.

Tablo 3 Hûmara Mertalan Goreyê Mintiqayan

Mintîqa	Hûmare
Aldûş	-
Çêrmûge	11
Çewlîg	-
Dêrsim	2
Gêl	11
Hênî	-
Licê	-
Maden	4
Motkî/Modan	5
Pali	-
Pîran	119
Sêwregi	7
Kome	159

Heman taybetî beşê mertalan de zî vejîyena verê ma. Mintiqaya Pîranî ra xeylê nimûneyî estê la mintiqayê bînan hetê nimûneyan ra zeîf mendê.

Tablo 4 Hûmara Zewtan Goreyê Mintiqayan

Mintiqa	Hûmare
Aldûş	-
Çêrmûge	102
Çewlîg	62
Dêrsim	5
Gêl	32
Hênî	52
Licê	13
Maden	6
Motkî/Modan	-
Pali	16
Pîran	285
Sêwregi	46
Kome	609

Zewtî bê rêzêna alfabetîk rêz biyê. Reyan ma tîya de zî giranîya Pîranî vînenê. Ma do derheqê nê halî de heme fikranê xo peynî de îfade bikerê.

Tablo 5 Hûmara Duayan Goreyê Mintiqayan

Mintiqa	Hûmare
Aldûş	-
Çêrmûge	1
Çewlîg	31
Dêrsim	2
Gêl	2
Hênî	21
Licê	7
Maden	4
Motkî/Modan	-
Pali	6
Pîran	80
Sêwregi	18
Kome	172

Duayê ke nuştoxî mintiqayanê cîyayan ra arê dayê tabloyê corênî de asenê. Çîyo balkêş reyna tayê mintiqayan ra nimûneyî nêdeyayê.

Sernameyanê kitabî ra yew zî “Estanekî (Istanikî)” yo. Nuştoxî mintiqayanê ke tede zazakî qalî bena ra tayê estanekî (sanikî) arê dayê. Semedo ke estanekî goreyê malzemeyanê bînan tayêna birêz ê û kes eşkeno goreyê sernameyanê estanekan înan tesbît bikero, ma do tabloyêno cîya virazê û estanekî yê ke nê kitabî de ravêrdê bi nameyê înan qeyd bikerê.

Tablo 6 Estanikê ke Kitabî de Ca Girewto

Nameyê Estanike	Mintîqa	Rîpel
Pîra Hewtsera	Pîran	201
Heneka Lîy	Gêl	207
Lûwa Tobedari	Gêl	211
Heş	Motkî/Modan	215
Dizd û Qiral	Gêl	217

Beşê estanikan ra dima beşê mesel û fiqrayan dest pakeno. Nê beşî de zî mintiqayanê cîyayan ra nimûneyê mesele û fiqrayan yenê dayene.

Tablo 7 Hûmara Mesele û Fiqrayan Goreyê Mintiqayan

Mintîqa	Hûmare
Aldûş	1
Çêrmûge	12
Çewlîg	-
Dêrsim	-
Gêl	3
Hênî	-
Licê	-
Maden	-
Motkî/Modan	-
Pali	-
Pîran	-
Sêwregi	-
Bêçime (Çimeyê mesel û fiqra nêdeyayo)	9
Kome	25

Nê beşî ra dima beşê “Hîkayeyê Heskerdişî” yeno û tîya de zî di hîkayeyê heskerdişî neqil benê. Nameyê hîkayeyan, mintiqaya ci û rîpelê kitabî wina yê:

Tablo 8 Hîkayeyê Heskerdişî

Nameyê Hîkayeyî	Mintîqa	Rîpel
Salo û Keja Paloy	Gêl	267
Sê Ehmed û Xeji	Gêl	280

Nê beşî ra dima “Qisey Diletî” (Reduplications) kitab de ca gênê. Tewir-tewir mintiqayan ra nimûneyê qiseyanê diletan yenê dayene.

Tablo 9 Hûmara Qiseyanê Diletan Goreyê Mintiqayan

Mintîqa	Hûmare
Aldûş	-
Çêrmûge	6
Çewlîg	-
Dêrsim	22
Gêl	59
Hênî	-
Licê	2
Maden	-
Motkî/Modan	-
Pali	2
Pîran	292
Sêwregi	17
Kome	400

Peynîya kitabî de sey beşê “Namey” beşek esto û nuştoxî nê beşî de îzahatê nameyanê tayê dewan, qezayan û şaristanan kerdo. Nê beşî de nameyê 43 cayan ravêreno û hem îzeheto cografîk hem zî nameyê nê cayan bi tirkî yeno dîyarkerdene.

Peynî (Encam)

Kitab bi şeklêko pêroyî folklorê zazayan ra xeylê nimûneyanê erjîyayeyan ano verê ma. Hetê tewiranê folklorîkan ra problemêka zaf gird çîn a. Labelê sey çina (kinc), werd, sey nîşan, hene, veyve, eza (şîn-tazîye) xususîyetan zî bibîyayê do başêr bîyayê.

Seke kitab de zî aseno çapa yewine serra 1991î de vejîyaya, ê serran de viraştîşê xebatanê kurdkî xeylê zehmetin bi û kes nêşkayê ke mintiqayan yew-yew bigeyro. Goreyê texmînê ma nê halî tesîrê nimûneyanê mintiqayan zî kerdo û nuştoxî zafê mintiqayanê ke tede zazayî ciwênê ra nimûneyî nêdayê. No zî sey kêmasîya nê kitabî vejîyeno verê ma.

Xêncê nê kêmasîyan goreyê wextê nuştîşî kitab zaf biqîmet û erjîyaye yo. Û xeylê xebatan rê zî çimeyî kerda.

FOLKLORÊ MA RA ÇEND NUMÛNEY

Arêkerdox: Malmîsanij



BOOK REVIEW / NIRXANDINA PIRTÛKAN DIMDIM

Erebê ŞEMO, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007, 256 rûpel, ISBN: 9789756179369

Ebubekir GÖREN*

Article Type: Book Review // Nirxandina Pirtûkan

Received // Hatîn: 11.12.2021

Accepted // Pejirandin: 15.01.2022

Published // Weşandin: 30.04.2022

Pages // Rûpel: 157-159

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0). <http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Gören, Ebubekir (2022). Dimdim (Book Review), *Kurdiname*, no. 6, p.157-159

Dimdim, romana Erebe Şemo ya sêyemîn e. Erebe Şemo, ji xeynî Dimdimê sê romanên din ên bi navê “Şivanê Kurmanca, “Jiyana Bextewar” û “Hopo” nivîsîne. Romana Dimdim, di sala 1969an de hatiye weşandin. Raboriya weşandina *Dimdimê* wiha ye. Roman, di sala 1969an de li Êrîvanê ji aliyê Weşanên Heypethtratê ve tê weşandin. Ev çap 572 rûpel in. Di sala 1972an de roman bo Rûsî bi navê *Krêpost Dimdim* (Kelha Dimdim) tê weşandin. Erebe Şemo û L. Ostogorskay roman wergerandine Rûsî û Weşanên Destkay Lîteratura jî li Moskowê çap kiriye. Ev çapa yekemîn a Rûsî 208 rûpel in. Piştî çapa yekemîn di sala 1976î de çapa duyemîn a romanê tê weşandin. Ev çap jî 208 rûpel in. Di sala 1974an de roman ji aliyê Erebe Şemo û N. Gorskay ve bo Rûsî hatiye wergerandin. Weşanên Destkay Lîteratura di sala 1974an de li Moskowayê ve wergerê çap dike. Werger ji 208 rûpelan pêk tê. Di sala 1978an de roman bi navê *Dimdim* bo Ermenîkî tê wergerandin û li Rewanê tê weşandin. Werger 218 rûpel in. Roman di sala 1983an de li Stokholmê, bi tîpên latînî ji aliyê Weşanên Roja Nû ve tê çapkirin. Di sala 1984an de Şukur Mistefa romanê werdigerîne zaravayê Soranî. Ev werger ji aliyê Qorî Zanyarî Kurd ve bi navê Dimdim li Bexdayê tê çapkirin. Werger 316 rûpel in. Di sala 2007an de Weşanên Lîs li Amedê bi navê *Dimdim* romanê diweşîne. Çap ji 256 rûpelan pêk tê.

Her sê romanên din ên Erebe Şemo, mijarên xwe ji bûyerên, li gorî dema nivîsê, aktuel digirin. Mijarên di van romanên de tîpên gotin yan Şemo bi xwe dîtiye yan jî nifşa pêşiya wî dîtiye. Lê *Dimdim* mijara xwe li gorî dema nivîsê ji bûyereke dîrokî ya ji du sed û pêncî salan kevintir digire. Şemo, bi vî romanê cara yekemîn bûyereke dîrokî kiriye mijara romanên xwe. Ev bûyer di sedsala 17an de li Çiyayê Dimdimê û derdora wî pêk hatiye. Weşandina vî romanê bûyereke berbiçav bû ku nivîsandina bedew a bûyereke dîrokî ya ewilîn e. Ne ku bi tenê di nav Edebiyata Kurdên Sovyetê de lê di ya tevehîya Kurdan de. *Dimdim* çiyayekî rojhilatê Kurdistanê ye. Destana *Dimdim*, bi sedan salan di nav gel de, di civatan de, di şevbihûrkan de ji aliyê dengbêjan ve bi awayekî menzûm hatiye vegotin. Ji bo romanê weke hîm destan, beyt û serhatiya zargotina gelê kurd a bi nav û deng Kela Dimdim hatiye weşandin. Ev beyt û serhatiya di nav zargotina kurdên Sovyetê de pir hezkirî ye. Li odeyan, di nav civatan tim dihate gotin. Çîrokbêjan him bi stran him jî bi cureyê şîrovekirinê digotin. Ev destan di rodyoya Êrîvanê de jî hatiye weşandin.

* Mezûnê Masterê yê Beşa Ziman û Çanda Kurdî. ebubekirgoren@gmail.com. Orcid ID: 0000-0002-6584-9166

Ev destan ji aliyê helbestvan Fêrikê Ûsiv ve weke radyokompozîsyon hatiye amade kirin û bi radyoya Êrîvanê salên dirêj hatiye dayîn. Bi van taybetiyên xwe şerê Dimdim di nav gel de bûyereke navdar e. Ji ber wê jî gelek waryantên wê hebûne. Ev waryantên destanê yê ji aliyê dengbêjan ve dihatin gotin, gelek taybetî û bûyerên awarte dihewandin. Şemo, ev waryant hemû nirxandine û ew bûyer kiriye mijara romaneke nûjen. Wî, taybetî û bûyerên awarte ji çîrokê derxistiye û bûyer gîhandiye terza romanê. Romanûs ew çîrokên xeyalî, fantastîk ku di destana gelêrî de hene derheqê dîtina zêran, çêkirina kelê, li dor navê peyva “çengzêrîn”¹ û bûyerên din, yê nayên bawerkirin daye aliyekî, ji romanê derxistiye, naverokeke hawaskar a realist afirandiye. Serkeftin û ciyawaziya romana Şemo jî ji vir tê. Ji ber ku gelek varyantên wê ji aliyê kurdzan ve ji nav gel hatine nivîsandin û çapkirin. Hinek helbestvanên Kurdên Sovyetê gotine ew veçêkirin e û ji xwe re kirine helbest û destan. Lê pêwîst e bi heqî bê gotin ku qîmetê wan nivîsarên ku li ser naveroka beyt û serpêhatiyên gelêrî ji aliyê nivîskarên Kurdên Sovyetê ve hatine nivîsandin pir nizm e. Hema bêje ji her aliyê efrandariyê ve ew ji yê gelêrî dadixin. Gerekê bi rastî bê gotin romana Erebe Şemo ji wan cuda dibe... Mezmezka destana gelêrî di romanê de hatiye xweyîkirin. Bûyer, nexş, ewaz tev dora wê mezmezkê hûnandiye. Xemleke kurmançî ya bi dilê xwe lê kiriye û heykelekî edebî yê nemir ji gelê xwe re afirandiye. Şemo, piştî ku mijar aniye forma romanê, îcar vegotina xwe jî li gorî rêbazên romanê hûnandiye. Wî, bi peyvan di romanê de karakterên xwe ewqas bi hostatî xêz kiriye ku xwendevan dibêje qey wan hemûyan ji nêz ve nas dike. Ew, wan lehengan him bi taybetiyên wan ên fîzîkî him jî yê takekesî û fikrî gelek baş xêz dike. Di romana wî de ji xeynî Xanoyê Çengzêrîn xwendevan rastî gelek qehremanên hizkirî tî, yê mîna Hemze Çawîş, Xaçoyê Ermenî ku topan çêdike. Koçoyê Kal, Mîr Sadiq, Şêx Zade, Cewzo, Sêvdînê Lawê Xano, Zadîna Jina Posto, Dîlber û gelekên din... Wisan jî li ber xwendevanan tê bibêjî derê dîwana Şahê Ecem, Şah Ebas vedibe. Li wir jî rastî tirs û xofê, qelpîtiyê, kînê, neyartiyê tî.

Di romanê de Şemo bi temamî ji vegotina binezm dest bernedaye. Wî, di rûpelên romanê de cî daye gelek helbest û stranên derbareyî mijarê de. Bi vî awayî wî him berdewamiya vegotinê pêk aniye him jî xwendevan ji tama vegotina binezm haydar kiriye. Balkêş e ku di vê romanê de Erebe Şemo gelek kilam û helbest jî bi kar aniye. Di van helbestan de hestên qehremanan tî zimên, di stranên de evîndarî vedije û her wisan şer û qehremanî, trajedî, şikestina berxwedana kelê, şewitandina xan û malên Kurdan, xwe kuştina qehremanan tî zimên. Erebe Şemo bi alikariya helbest û stranên nahêle ku xwendekar aciz bibe û herikbariya berhemê bişkê. Serkeftineke din a Erebe Şemo di romana *Dimdim* de ew e ku Şemo, mekan û bûyer jî bi awayekî pir serkeftî teswîr kirine û li ber çavên xwendevan şênber kirine. Di romanê de Kela Dimdimê bi çarsû, bazar, dikan, qawexane, hostexane, kuçe û meydanên xwe mîna dîdemeke zindî tîne ber çavên xwendevanan. Nivîskar ew wisan nitirandine ku tê bibêjî bajarekî hasê yê bedew ê biçûk e. Li dorê gund û eşîrên Kurdan e. Xelkê xebathez bi kar û barên xwe ve mijûl in. Sira mezinayî û serkeftina Xanê Çengzêrîn ew e ku ew li aliyê heqiyê û qencyê ye. Xwestina wî edlayî û aramiya welatê wî ye. Yekîti û tifaqa xelkê Kurd kirine mîna kulmeke pola. Kurd ji xeynî biratiyê, wekhevîyê û jiyana ‘edil tu tiştî ji kesî naxwazin û nahêlin tu qewet azadiya wan ji wan bistîne. Lê aliyek kela dimdimê azadîhez e, aliyê din di Tehrana rengîn de Şahê ecem ê devxwîni

¹ Ji bo serokê Kela Dimdimê Xano bêjeya çengzêrîn tî bikaranîn. Tê gotin ku Xano, di dema çêkirina kelê de bi çengan zêr li karker û hostayan belav kiriye loma jî ev nav lê hatiye dayîn.

bi qetil û qan e. Daweta Şah e. Xwedê dizane daweta wî ya çendan e. Bûk keçeke çardeh salî ye. Di dawetê de jî Şah û neyarên Kurdan derheqê wêrandina Kela Dimdimê de difikirin. Şênbûn û azadiya wî warê Kurdan tirs û kîn kiriye dilê Tehranê de. Bi riya casûsan, bi dek û fenan, bi zorê û kuştinê bi hevkarîya tevî Sultanê Romê... Her mecal tê ceribandîn ku Kurdan di nav xwînê de bipelçiqînin. Nivîskar bi nimûneyan xwendevanan dide bawer kirin ku eger tifaq di nav Kurdan de hebe kurd piştê hev bigirin, li hev xwedî derkevin kes bi wan nikare.

Bi van taybetîyan *Dimdim*, romana herî serkeftî ya Erebe Şemo ye. Şemo, bi vê romanê hostatiya xwe ya di warê romanûsiyê de îspat kiriye. Romana xwe li gorî rêbazên romana nûjen hûnandiye û ew kiriye yek ji girîngtirîn berhemên wêjeya Kurdî.

